

ROJANÛ

kovara huneri çandi û edebi



49
1997

NAVEROK

400 saliya Şerefnameyê piroz be!- B. Berfin.....	3
Serpêhatiya Şerefnameyê	
lî welatên Rojavayê - İlhamî Yazgan	5
Jîn dî civata kurdi de -Mecide Qazi.....	8
Pirtûkeke nû ya helbestan: "Derdname"	14
Qadi Şero - B. Botani	16
Zımanê Stranan - Mehmet Bayrak	18
Hejmar - Sîtqî Hırori	20
Fêrikê Üsiv - Têmûrê Xelil.....	24
Gotnên pêşiya - Salih Omeri	28
Çend stranên folklorik (2)- M. Lewendi	29
Helbest-Vazgal Bazidi	30
Şano, "Zewaca Şaş" B. Eser.....	32
Erebê belengaz û şewiti - William Saroyan.....	36
Hevpeyvînek dî gel Sîtqî Hırori -	41
Nameya vekirî - M. E. Bozarşan.....	45
Jî nav weşanên nû	46

Sal:19, Hejmar: 92, 1997

Wênayê qapaxê:
Meclisa Şerefxanê Bitlîsî
(Jî arşîva Jîna Nû)

ISSN 0283-5355

Xwedi: KOMKAR-Swêd
Redaktorê berpirsîyar:
Haluk Öztürk
Redaksiyon:
Haluk Öztürk
Ahmet Cengiz Çamlıbel
Bûbê Eser

Utgivare: KOMKAR- Swêd
Ansvarig utgivare: Haluk Öztürk
Adress:
Gustavslundsv. 168 A, 1 tr.
167 51 STOCKHOLM
Tel: (46)+(08)+ 262375
Fax: (46)+(08)+ 25 3857
PG (hesab no:) : 458980-0

400 Saliya
DİROKA KURDISTANÊ
ŞEREFNAME`YÊ
Piroz be!



ŞEREFXANÊ BITLISÎ

B. Berfin

ŞEREFNAME pirtûkeke diroki û yekane ye ku bi destê kurdeki dilsoz, mireki camêr **ŞEREFXANÊ BITLISÎ** hatiye nivîsin. Lî gor rojhilatnasên navdar ev pirtûk di roja 13 meha tebaxê sala 1597'a da bergê yekemin, bergê duwemin jî meha gulanê sala 1599'a da xilas kirîye.

Şerexanê bi nav û bang di destpêka nivîsin û tomar kirina wê pirtûka xwe ya di-

roki da dibêje: "Ez dirokeke wusaye kurda tomar bikim ku heta hetayi neyête jî birkim. Jî ber ku heta iro çu diroknasan behsa Kurd û Kurdistanê nekirine. Lema ezê navê wê pirtûka xwe ya diroka Kurdistan, bi navê "ŞEREFNAME" navdar bikim."

Şerexname jî bo ruhnikirin, ditîna bûyer, serhed (xet), mir, desthilatdari, dewlet, şer û kesên herema rojhilata navin, çavkaniyeke gelek giring û pîr buha ye.

Bo cara yekê MELE MEHMÛDÊ BBEYAZIDÎ bergê yekê ya Şerefnameyê wergerandiye kurdi (1858-1859) Ev kiryarê hêja bî harikariya Aleksander Jabayê navdar û kurddost va çêbûye.

Şerefname ya ewil dî sala 1669'a da jî alyê Mirê Bitlisi AHMED BEGÊ MÎRZO va bî kurdi tercumeyê tırki hatiye kîrîn. Ew wergêra dî pirtûkxana Şerdariya İstenbolê da nav nîvisên M. Cewdet da lî hejmara 0/29 da hatiye parastin.

Dî sala 1862'a da lî St. Petersburgê bî Firansîzi jî aliyê V. VELTEMİNOV ZERNOV hatiye çapkîrîn.

Mamoste SLÊMAN SAVCI dî sala 1930'a da lî bajarê Amedê Şerefname wergêrandiye Tırki ser pitên latini niha ew pirtûka dî nav Pirtûkxana Gıştî ya Amadê lî hejmara 2065 da hatiye ragirtin. Ew pirtûkxana herdu pişkên ewil niha lî Britisch Museuma Londirê da hatine parastin.

MELE CEMİL BENDİ ROJBİYANÎ Şerefname wergêrandiye ser zimanê Erebi û dî sala 1953'a da lî Bexdayê daye çap kîrînê.

MIHEMED ALİ AWNÎ dî sala 1958 da Şerefname farisi lî çapê daye. Piştî ra dî sala 1962'a da jî aliyê Wezerata Çandî ya Mısıre wergêra hêja disa jî aliyê M. Ali Awnî lî Qahirê çap bûye.

M. EMİN BOZARSLAN Şerefname jî erebi wergêrandiye ser zimanê Tırki lî İstenbolê daye çapkîrînê. Ew wergêr 3 cara lî Tırkiyê hatiye weşandinê. (Dî salên 1971, 1976 û 1990'an da)

Ya duduya dî sala 1981'a da bî navê Şemî an jî Samî hatiye tercumekîrîn. Ev wergêr Tırki ye.

Dî sala 1972'a da MAM HEJAR MUKRIYANÎ (Abdulrehman Şeref-kendi) jî Farisi wergerandiye Kurdi (Bî zaravê sorani) û çapkîriye. Mam Hejar dî jiyana xwe ya pêşmergetiyê da, dî bîn êrişên bombên dagirkerên Kurdistanê da lî şkeft, çol û çiyayên Kurdistanê da piştî yek sal bî izah û cefa tercumeyî zimanê kurdi dîke û bî zarê sorani çapkîriye. Mam Hejar bî vê kiryara xwe va, libasên ecemî, jî ber "ŞEREFNAME" derxist û şal û şapîk, şal û dersok lî bejn û bala Şerefname kîr. Ew bî rext û çekê zimanê pîr şîrîn û dewlemend ê kurdi xemiland. Bî vî avayî Mam Hejar ruhê Şerefexan û pirtûka Şerefnameyê jîndar kîr. Bî zimanê xweşik û dewlemenda xwerêse kurdi, Şerefname xelati gelê Kurd kîr.

Dî wergera Mam Hejar da hebûna gelek pêşgotin û ditinên mirovên navdar û kurdizan her usa pîsporên rojhilatnas, ewî wergêrê jîndartir kîriye. Lewna wergera mam Hejar bî nav û dengtîrîn tercumeyê Şerefnameyê ye. Çunki jî farisi hatiye wergerandin. Dî zimanê farisi erebi û kurdi da pîsporiyeke mezîna ya mam Hejar hebûye.

MAM HEMINÊ MUKRIYANÎ, hozan û nivîskarê navdar, pêşgotineke gelek zelal û hozanvani lî ser wergêra mam Hejar nivîsandîye. Wexta mirov wergêrê dîxwine, mirov hingê baştir dîzane qedir û kemala wergêra Şerefname.

ALAEDDİN SECADÎ, KEMAL MEZHER, MESÛD MEHMÛD bî hurbîni lî ser wergêrandina Mam Hejar dîsekinîna û jê gelek razî ne.

Em umîdwar in ku dî rojên îro da Kurd qedir û qimeta vê pirtûka gîranbuha bigrîn. Jî bo mirê me ye Bitlisi carek dîna jî jîndar bîkin, her usa haj jî diroka xwe bîna.

Dî 400 saliya wê da


serpêhatiya diroka

Kurdistanê

ŞEREFNAME'YÊ

lî welatên rojavayê

■ *Ilhami Yazgan*




Dî sala 1858 'a da , ji aliyê *Dr. Heinrich Alfred Bard* va xebateke zanisti bî navê *Tarich el Akrad* di sê cildan da û lî Akademiya Dewletê ya Viyanayê hate pêşkêşkirin. Ev sê cildên xebata ilmi ya ku di 9'ê gulanê sala 1858 'a da , di konferansê da hate pêşkêşkirin, encamê lêkolina *Dr. Heinrich Alfred Bard* ya du salan e, ya ku wi di navbera salên 1846 û 1847 'an da lî Iranê kiribû. *Dr. Heinrich Alfred Bard* rave dike ku beri ew dest bî lêkolina xwe ya lî Iranê bike tenê navê wê û hebûna wê bîhistiye, û haya wi hebûye ku ev berhem bî awayeki hûrgili lî

ser tarixa Kurdistanê ya sedsala 16'a agahdariyên hêja dide.

Dr. Bard, dema ku ji ber xebatên xwe yê ilmi lî Iranê bûye, bî tesadufî nusxeyeke *Tarich el Akrad* dikeve destê wi. *Dr. Bard* lî ser vê berhema ku berfirehiya wê ya diroki jê ra ne malûm e, û bî zimanê farîsi hatiye nivisandin û nêziki destnîvisa orijinalê ye, dixebite, piştî vekolineke baş têdîgihîje ku ev berhema hêja diroka kurdan *ŞEREFNAME* ye, berhema dirokzanê kurd ê hêja *Şerefname Bitlisi* ye, ku di sedsala 16'a da jiyaye û di sala 1597'a da nivisandina wê kuta kiriye. Ew dibîne ku

berhem derheqa Kurd û Kurdistanê da gelek agahdariyên hûr û kûr pêşkêş dîke. Ev berhema Şerefexan ewçend bala Dr. Bard dîkîşîne ku ew bî hewesdari dîkeve dûv orijinala wê û lê digere. Jî ber ku ew tesbit dîke ku ew nusxeyê ku li Îranê bî destê wi ketiye, tê da kêmasî heye, ne tamam e.

Dr. Bard, wek şanseki mezin jî xwe ra dîhesibîne ku dî destê wi da nusxeyên farisî yê Şerefnameyê hene, û bawer dîke ku li dervayî Kurdistanê peydakirina Şerefnameyê ne mumkun e. Lê disa jî dema vedigere Ewropayê biryara xwe dide ku li orijinala Şerafnameyê bigere û peyda bike. Hema çawa xwe digihîne Viyanayê dest bî xebatê dîke. Notên pêşîn yê li ser Şerefnameyê, li pirtûkxana *Herbelots Bibliothéque Orientale* dî kitêba *Tarich el Akrad* da derdîkevin pêş *Dr. Bard*. Dî vê berhemê da tenê malûmatên li ser *Selaheddin Eyûbi* dîbine. Hingê *Dr. Bard* bî biryareke xurt jî bo ditina Şerefnameyê li Ewropayê xebata xwe didomîne, heta ku dî sala 1815 'a da, dî nav rûpelên berhemeke geştewanê inglîz *John Malkom* ya bî navê *Geschichte von Persien* da tesbit dîke ku dî gelek rûpelên wê da jêderk jî *Tarich el Akrad* hatine wergirtin. Piştî lêkolînên xwe digihîje wê qenaetê ku yekemin ewropî ew e, yê ku firsenda lêkolîna Şerefnameyê li Ewropayê bî dest xistiye. Li ser vê yekê *Dr. Bard* dest pê dîke derheq *Malkom* da çî berhemên ku hene kom dîke û li ser dîxebite. Û dî sala 1827 'a da rasti berhemeke nûçapkîrî (1827) ya *Mackdo-*



Tabloyek ji ŞEREFNAMEYÊ: Bajarê HIZAN
ji arşîva Weşanên Jîna Nû

nald von Kinneier tê. Ev kes yek jî hevalên Malcom e ku digel wi çûye li Asyayê geriyaye. Navê wê berhemê jî *Stehekes of Persia* (Band 2) ye. Aha bî rîya vê gernameyê *Dr. Bard* bî ser va dibe ku *Malcom* bî çî awayî xwe gîhandîye *Diroka Kurdistanê Şerefnameyê*.

Dr. Bard jî berhema Von Kinneier hayedar dibe ku Malcom Şerefname jî axayê eşîra *Mohîzî* standîye, dûra, jî ber ku kêmbûye, aniye Şerefname daye waliyê Senna da ku kitêbê tamam bike. Lê *Dr. Bard* pê nîzane ka ew Şerefnameya kêmbaşê disa jî

aliyê Malkom va vegeyriyaye Ewropayê yan na. Dr. Bard berê xwe dide ser berhemên geştevanên ingiliz yê ku li Kurdistanê geriyane. Dî sala 1836' a da jî aliyê misionerên ingiliz yê ku li Bexdayê diman, xebatek hat weşandin bi navê *Narratives of a redisense in Kordistan*. Dî vê da tê diyarkirin ku geştevanê ingiliz *Cloudius Rich* pişti ku bêwestan û bi bîyardari li Kurdistanê digere û di dawiyê da li Silêmaniyê Şerefnameyê bi dest dixin. Pişti Malkom kesê ku cara pêşiyê firsenda vekolinê li ser diroka Kurd Şerefnameyê ditiye *Rich* e. Û *Rich* e kesê ku cara yekemîn Şerefname Aniyê Ewropayê. *Dr. Bard* navbirê nade xebata xwe, û di bin ronahiya van agahdariyên nû da, ser hise-hisê dikeve ku li *British Museum* nusxeyê Şerefnameyê heye. Ew jî muzeyê daxwaza destûrê dike ku li ser vê nusxeyê bixebite, yan jî qet nebe wê û nusxeya farîsi ya di destê xwe da rûberî hev bike. Serwerên *British Museum* bersiveke neyînî didine daxwaznameya *Dr. Bard*. Li ser vê yekê, bîyara xwe dide ku êdî zêde Şerefnameya ku li Îranê bi tesadufî bi destê xwe xistibû û wergerandibû almanî, nede seknandin. Wî Şerefnameya dest xwe da - ku beşê 3. jê kêmbû, pêşkêşî *Akademiya Dewletê ya Viyanayê* kir. *Dr. Bard*, dema Şerefname wergerandiyê almanî (1), gelekî girêdayî orijinalê nusxeya farîsi maye, û kedeke mezîni daniye ser vê xabatê, ev yek jî wergera wî ya gelekî baş diyar dibe.

Şerefnameya ku *Dr. Bard* di sala 1858' a da pêşkêşî *Akademiya Dewletê ya Viyanayê* kiriye, jî sê beşan pêktê. Beşa çaremîn, yan jî ya sêwemîn ya ku di destnîvisara orijinal ya Şerefxan da heye û ku li *Universita Oxford*, li pirtûkxana *Bodleian* li numra 312 qeydîkirî ye, ew di wergera al-

manî ya *Dr. Bard* da nîne.

(1) *Bilî zîmanê almanî Şerefname li van zîmanan hatiye wergerandin.*

Rûsi, sala 1860

Fransi 1868

Erebi 1948

Tirki 1971

(**MEHMET BAYRAK**, di kovara **DENG**, jîmara gulan-beziran 1997' an da, di mîqala xwe "Xebatên Kurdolojîyê li Tirkîyê" da weha dimvise: "Heta demên nêzik jî welê dihat zanin ku tenê sê nusxeyên nuvisê yê Şerefnameyê hene. Lê berî çend salan min li Kûtêbxana Silêmaniyê lêkolînek kir; tenê li vî min 5 nusxeyên wê ditim. Yek jî van, herçend wek wergera tirkî tê zanin jî, min dit ku tevaya wan nusxeya bi farîsi ye. Li aliyê din, bilî vana li Kûtêbxana Mîlet ya li Fatihê (li beşê Pirtûkên Ali Emiri) û li Kûtêbxana Beledîya Istenbolê (Kolleksiyona Muallim Cevdet) du wergerên bi tirkî hene. Jî alî **Mehmet bin Ahmet Bey Mirza** va, li orijinalê xwe girêdayî, di sala 1669' a da hatiye wergerandin. Rohlatnasê bi navê *deng Babinger* rave dike ku yek jî nusxeyên ku **Şemî wergerandine tirkî** li Kûtêbxana Beledîyê û du heb jî li *British Museum* in. Nusxeyê vê berhemê ku li ser daxwaza Atatürk jî alî **Süleyman Savcı** va bi tirkî û latîni hatiye hazîrkirin, li *Diyarbekrê* li Kûtêbxana Umûmî û li Kûtêbxana *Saziya Diroka Tirkî (Türk Tarih Kurumu)* di beşê *Tercüme Eserler* da hene.

TÊBÎNIYÊN ROJA NÛ

- Me ev nivîsa I. Yazgan jî rojnameya HÊVÎ, hejmarê 28' a wergirt û jî tirkî wergerand.
- Li gor agahdariya ku me girtiye, ŞEREFNAME jî alî Ziya Avcî va li Swêdê hatiye wergerandin ser tipên latîni - Kurmancî û wê di pa-yîza 97' a da derkeve.

Jin dı cıvata kurdi de

Macide Qazi

DAYIK

Cıwantrın axıvtın ji devî derdikeve navê dayikê ye, cıwantrın gazikırın ew e devê zarok dibêje *da* an ji *dadê*.

Dayik naveki biçûk e, lê tiji hivi, evî û xweştivi ye. Dayik şini ye dı kovanan de û hivi ye dı tengaviyan de û hêz e dı sisti û xaviyan de. Dayik kanika dilovaniyê ye, rûbarê rehmê ye, ewê dimine sêwi, dê bîmine bê sing serê xwe pal detê, ew zarokê dimine bê dayik, heta heta dê bîmine bê destê piroz, ji ber hindê dayik naveki şirin e, mezintır e ji hemû peyv û axıvtınan, dayik awaza jıyanê ye, ronahiya paşerojê ye, hetava pêşkevîne ye bo zarokan. Ji ber hindê heger yek nıfrına lı yeki bike, dê bêjîtê, bê dayik bîmini, heger zarok sêwi dibe, beze dibe dı nav pêlên jıyanê û şılqên wê yên dijwar.

DESTGIRTIN

Zanayên abûri dibêjin ku mirov bê destgirtın ne şêt hemû kar û barên xwe bî rengeki baş ji bo cihinana jineke xweş, pır keyf û bê qusûri bî rê ve bibe. Her wesan van zanayan aşkera kırıye ku ev armanc hında bî zehmet nine. Belê pıçek zehmet-kêşan, xwewestıyan û çavdêrikırın divêt,



da ku mirov bıkarê xweşiyê û tenahiyê ji bo mala xwe peyda bike. Ji ber hindê ji berê were miletê kurd hızza paşeroja xwe dıke, çunku miletê me gelek bırs û hejari bı çavê xwe ditiye. Mırov pêdivi ye destê xwe bıgre da ku bışêt belengari hemû tengaviyan û reşerojan bıbe û paşeroj ji bira mirovi ne çê.

NEXT

Herê ta kengi next dê gıran bîminın? Xuşka delal! Beri hatına İslamê xelki

FOTO:
Baran FUNDERMANN
(Jı arşiva Roja Nû)



keçên xwe bî saxi diveşartın, çunku dî hızza wan de ev keç dê serşoriyê bo wan peyda bıke. Lê piştî hatına İslamê ayetek dî Qurana piroz de hate xwar lî ser vê çendê û hate aşkerakırın ku kuştına keçikan gunehê gelek a mezın e. Lî ser demê pêxemberi (silavên Xudê lî ser bın) lî ser demê suhabıyan de guhurineke gelek mezın kevte dî nav mısılmana de û jinkê

qedrê xwe û cihê xwe dî nav komelê de bî başi girt. Jı wi demi ta evroke xebat û bızaveke mezın ya têtê kırın, da jınık weki zelami bî serfirazi bijit û mafê axıvtınê û jıyaneke serbest hebe.

Xuşka berkevti! Heger em rûpelên dirokê wergêrin dê binın ku bî hızzaran jı jıkan navên wan yên mane sax dî nav miletên

wan de û gelek ji wan yê hatine kuştin û kulilka genciniya xwe werandin ji bo ronkîrîna ew rêka bi xwe girtîye. Miletê me yê kurd yek e ji wan miletên li bin destê nextgiranîyê dînale û bazîrgani bi vi nextî têtê kîrîn; her weki kîrîn û firotinê, bab dê keça xwe bide şû û daxwaza nexteki giran dîke, da biçê jîneki ji xwe re bine. Lê hîzrê nake ku yê bûye xûnmêjê keça xwe, çunku dî paşerojê de keça wi dê kovan û rondîkan bine û ewi ha ji çî nine. Vêca heger mirovi xweşîya keça xwe bivêt, berê xwe nade pare û nextî, belku dê li wi tîştî bigere ku jîna keça wi xweş bike, ne ku asteng bike. Dî ser hindê re hindek dayîk hîzrê dîkîn ku bextîyarîya keça wan bi zêr û paran e. Lê gelek serhatiyên heval û mirovan û hogiran, ev hîzîr bi derew derêxistin. Bî vê çendê hîvîya me ew e ku hemû keç bîzanîna ku avakîrîna hêlinekê ne li ser zêr û pareyan rawestîya ye, lê li ser evîne û peydakîrîna jîyaneke xweş ya pîr bi kenî û dîlxweşî. Çunku gelek malên dewlemend hene ku xweşî û evîni li wan hîzret e, lê gelek a mişê ye dî maleke hejar de.

BÛK Û XWESÛ

Çîroka bûk û xwesuyan gelek a dirêj e. Ew hevrikîya li navbeyna wan de heye dî gel destpêkîrîna jîne ya peyda bûye. Çend bûk û xwesû li vê dinyayê hebîn, sergêji û qîre qîr ji dê hebe. Kovan û êş û nexweşiyên vê hevrikîyê egereke mezîna kîrîye ji bo paşkevîna mîletan, evê çendê derze û xîlîyek êxîste navbînyatê komelê. Her wesana êşeke mezîna bû bo gelek mirovan û ne dîşîyan çî çaran bo danîna û xwe jê bîparêzîn. Gelek bepîrsîyar û zanayên say-

koloji aşkera kîrîn ku çî tîşt ji hejêkîrîna dayîkê bo kurê xwe an ji bo keça xwe mezîntîr û dijwartîr nine, lê gelek çaran ev hejêkîrîna kore nexweşîyan û sergêjîyê bo kûrî, an ji keçê peyda dîke şûna xweşîyê. Ya ji dayîke were axivtîna û şîretên wê hemû gavan baş in û tenahîyê dê bo kur û keçên wê bi çîhîntî. Lê mîxabîna ev çend e zîyanê dîgehîna wan. Ji ber hindê heger em bi çaveki hûr û bi dîleki pakîj û hîzreke serbest û pêşkevîti berê xwe bîdîne ne xweşîya bûk û xwesuyan dî nav mîletê kurd de, pêdîvî ye em hindek rastîyan bîzanîna û egerên vê gîrîftarê dîrîst bîkîna û ne hêlîn. Her wesana hemû axivtîna û gotînen bab û bapîran dî çarkî û sê çarkî li bêjînkê û moxîlkê bîkîna û pîştî hingê li destarî bîhêrîn, dê zanîna ku xwesû berî ku bîbe xwesû, dayîk bû û her dayîkekê dîlovîni û vîyan û evîneke dijwar heye beramber keç û kurên xwe, ji ber vê çendê pêdîvî ye em bi çavek bîlînd berê xwe bîdîne dayîkê. Çunku dayîk mezîntîr e ji hemû gotîna û peyvên em dîbêjîn.

Hevrikîya bûk û xwesû gelek a dîrêj e, mîletê me yê kurd gelek sîran û serhatiyên dirêj pê gotîna, lê li dîv pêşkevîtin û rêveçûna jîna evroke û ew çerxê em têde dîjîna em dîkarîna bêjîna ku xwesû gelek a hatîye rezîlkîrîna dî nav mîletê kurd de. Pêdîvî ye em bîzanîna ku dayîk çî evroke, an dî paşerojê de dê bîbe xwesû, her wesana bûka evroke ji sîbehi dê bîbe xwesû. Demê keça êkane şû dîke û dayîka wê dî gel dîjît, dayîk wesana dî gel kîkê dîhaxîve her weki hêştî zarok e li malbabê û ji bir dîke ku keça wê ya bûye xudan mêr û mal.

Demê her nexweşîyek li navbera bûk û

zavayi peyda dibe, xwesû yekser dê mayê xwe têke, çunku li dûv hızra wê ew ji her dukan mezintir e û xudan serhati ye û ji wan çêtir dızane, divêt ew her du (bûk û zava) guhê xwe bîdînê. Bî vê çendê dê mayê xwe di hemû tîştan bike, her wesana dê wesana hızır bike ku ew keça bî jar û jiri bî xudan kirîye, ya bûye milkê mîroveki bîyani û ya ji destan çûye, ya ji wê ve keça wê guhê xwe na de wê, lê bi axıvtına mêri dike. Bî vê çendê keç dê mine heybeti ka guhê xwe bîde kê?! Dayikê an mêri, û herduk li dev xweşdivi ne. Bî vê çendê dê gelek bî dayikê ve bîmine ku bête ser rê, lê fayde na ke, roj bo roj giriftari dê zêde be û ne xweşi li dûv de peyda be. Çêtirin rêk bo ne hêlana her nexweşekê, pêdivi ye bûk û zava têgehîştêti bin û çî tîştî li xwesuyê ne girin, bî rêka axıvtin û dan û standinê de hemû nexweşiyên û astengan dî jîna xwe da ne hêlin.

Dî ser hindê re beramber hindê ji pêdivi ye ku xwesû ji demê dibine ku keça wê, an ji kurê wê bî hêmini dî gel mêrê xwe, an kur dî gel jîna xwe bî riheti yê dijî. Pê nevêt xwesû mayê xwe dî wan bike û ne xweşiyên bî wan çêke, keyf û kenîyê ji malê birevine û jîyana wan şêli bike. Em bî vê çendê piştî bûk û zava na girin. Lê me divêt rastiyê bilind bîkî, çunku bûkên xırab ji hene û xwesuyên ji dayikan ji çêtir hene.

MÊVANDARÎ

Gelek caran mîrov bî mêvandarî qesta mala xızim, kes û karan dike, hundek kar û rûdan di hêne kirin, mîrov dilteng û pê nexweş dibe. Beri heyamekê maleke nîyas em mêvan kirine şivê, em ji çûne mala

wan, me dit kareki gelek mezin kirin; şiveke zêde ya dirist kirîye, gelek ji me zêde bû, bî vê çendê me pîsyara kabaniya malê kir ka çawan gehîştîye evê hemû xwarinê dirist bike. Îna gote me ku wê dayik û xwişkên xwe anîne harikariya xwe û kirine qebale, da ku wê nişa me bîde li dûv hızra xwe ku qedrê me girtîye. Belê em dibêjinê ev e ne azayi û methene, ne qedirgirtin e, çunku ew xwarin behra pîtrê jê hate havêtin, ma ne mixabîn e?! Belê heyf û mixabînên vê kabaniyê ya qedera destê xwe û dest diriyayî be û bê hızr û bir kar dike, çunku viyan, rêzgirtin û hejêkirin bî dili ye, ne bî xwarinê ye.

MERDANI Û QELSATI

Demê kabaniya malê destê xwe digre, ew nine ku ya qels e û rezil e. Gelek caran me guh li vê axıvtinê dibe an ji hinde caran em bî xwe pê di haxivîn, lê pa divêt cudahi li navbeyna rezilyê, çavtariyê, merdaniyê û destgirtinê bête kirin. Mixabîn gelek ji me wesana têdigeşin û dızanin ku jîna merd ya destdirya ye û bî kêr ne hatiye, belê ya rast ji ew e heger merdani dî çihê xwe de û dî demê xwe de ne be, na bêjine vê merdani, belê destdadiryayî ye. Li vêrê bo me aşkera dibe ku dayik divêt bîzanibe ka dê çawan destê xwe bigire dî berhevkirina xwarinê de, çunku her zêdeyek dî xwarinê de tete havêtin, lê heger bêt û berhevkirin li dûv qedere xwe be, çî ziyanan na gehine malê. Ji ber hindê her dayikek divêt agehdar be û bîzanibe ka qedera karê wê çend e? Vêca ev qedere, xwarin be an vexwarin be, çunku nexşe her maleki zîrekîya kabaniya wê malê diyar dike.

RASTIYA JIN Û MÊRAN

Rasti navbeyna jin û mêran kareki gelek cıwan e, da bişên her du pêkve ber singê gıriftariyên jıyanê bigırın, gelek caran ji ev rasti dibe egera (ûşt, sedem) herifandına hêlina malê û gefê li paşeroja jin û mêran dıke. Jı ber hindê pêdivi ye derew dı jıyana herdukan de nemine, çunku baweri na mine û dibe egera cudabûna herdukan. Bı vê çendê rasti, dılfırehi û têgehıştın dı jına jin û mêran de pêdivi ne, da bı xweşi û bê şer û qır qır bıjin. Heger bêt û jin hınde k tıştan ji nıyasên xwe an ji ji zarokên xwe veşêre, divêt ji mêrê xwe ne veşêre û dilê xwe jê re veke, çunku jıyana evro ne weke jıyana caran e. Ev pêşkevıtın û guhartın a ketıye dı jıyana me hemıyan de û we li me dıke ku em dı jıyana xwe de rastiye bıkıne rêk.

DILFIREHI Û LÊBORIN DI JIN Û MÊRAN DE

Diltengi û xemgini yek e ji egerên wêranbûna jına jin û mêran e. Heger yek ji wan dilteng bû, dê dest bihavêje axıvtınên kirêt û nexweş, bı vê çendê, dê nexweşi dı navbeyna wan de peyda be. Lê piştı bêhnê her du dê sar bın û dê peşiman bın bo wan axıvtınên ku ji devê wan derkevıye. Belê dı gel hindê ji xemgini piçek dê dı dilê wan de bımine û sıst û xavi ji dıkeve nêv de û paşerojeke reş dê li hıviya wan be. Heger bêt û peşimani û lêborin dı navbera jin û mêran de hebe, hêmû nexweşıyan çend mezın ji bın, dê mehine û na hêle. Ya zana ji ew e ku saykoloji aşkera dıkın û dibêjin ku divêt jin û mêr xwe ji xemgini û diltengiyê dır bıkın û dı asayi bın demê tışte k li navbeyna wan de çê dibe. Her

wesan saykolojiyan ye aşkera kırım ku çı jin çı mêr, divêt demarên wan demê nexweşıyayn û diltengiyê gelek sar bın.

Em dibêjin ku divêt jin ya xudan demarên sar be û diltengiya mêrê xwe bı dileki berfireh qebûl bıke, çunku ev kar weku ewrên bıharê ne, zû tén û zû dıçın. Jı ber vê hindê demê mêr ve gıriftarê jê dibine, helbet ew ji dê sar be, çunku dılpaqiji, destûri û lêborin cıwantırın tışt dı ve dinyayê de ne.

Dê çawan zarok bıjin demê dayık û babên wan ne şên pêkve bıjin? Helbet encamên ve nexweşiyê jêkvebûn û jêkdûrbûn e û dê kovanan ji zarokan re peyda bıkın, nexasme ji layê fêrkırınê û jıyana cıvaki ve. Jı ber hindê pêdivi ye dayık û bab beri bıyara cudabûnê bıdın hıızrên xwe bıkın û jına zarokên xwe yên bêguneh reş ne kın û tehliyê ji wan re dırıst ne kın. Heger evro zarok bı ve gıriftariyê ne hesıyt û tenegehe, belê piç piçe ta mezın be ji nû dê hêbeti be ka dê hej kê bıke? Dê dı gel kê bıjit? Dê dest bı pısyara bıke ka ew dê dı gel kê ji wan bımine û çıma ev e bı seri hatiye. Ev hemû tışt e ji dê guhırinekê bıxe dı jına van zarokan de.

HÊVI

Jı mej e were ta vi demi çirok û çıvanok û suhbet û gotınên hewıyan ser zımanê miletê me tene gotın û veguhastın. Gelek metelok û hozan û çirok û serhati li ser vê çendê hatine darıştın û çêkırın, hınde k ji wan rast û dırıst bın û hınde k dıtır zêde pêve çın û derew bın. Heger bêt û em bı çaveki hûr û kûr berê xwe bıdıne dırokê, dê ji me re aşkere û ron be ku bab û bapırên me li berê bı jıneke bı tınê razi ne

dîbûn, nemaze heger ev mirov piçekê halxweş ba, ji bilî hindê ji ev çend e edetek bû zelaman şehnazî pê dîkîr, ew ên du jin, an sê hebane, serbilind bûn. Lê her çî mirovê hejar dî hemû çerx û zemanan de ji vê sergêjîyê û belayê yê dûr bû, çûnku wi nan ne bû ku bixwe, lê her çî hal bû xwe û xêzana xwe dijîyand û yê betîyar û kamîran bû.

Miletê me yê kurd yek e ji mîletên mîsilman û bawerî bî Xudê heye û em hemû dîzanin ku mîsilmanetîyê rêkê daye mirovî ta çar jînan bine. Ji ber vê çendê mîrê kurd ji jînekê pîtır dîhîne, çûnku lî dûv bawerîya wi ew ê rast e û çî gunehî têde nîne. Lê pêdivî ye em bîzanin ku mîletê me hêştî yê paşkevî ye, nexwîndewarî û nezanîn êşeke dijwar e û gefan lî pêşşkevîna mîletî dîke û bînyatnana wê xîlîle û xav dîke. Lê evroke çavên me vebûn û em dîbînîn ku çend em paşkevî û veman. Babetê hewîyê peywendîyeke mukum ya heye dî gel pêşkevîna û rêveçûna mîletî ve, ji ber hindê pêdivî ye em dîrîstî xemê jê bîxwun û pûte bî vê astengîyê dîkîn. Çûnku ew şoreşa dî nav mîletî de dest pê dîke bo pêşkevîna, şoreşeke dijwar e dîji hemû edet û rewîştên kevin û bê fayde ew ên mirovên kurd dûr dîke ji hemû kovanên mîletî, her wesân ev edet û kar û rewîşt e, mirovî ji hemû agehdarîyên rêveçûn û pêşkevîna mîletî mijûl dîke. Lê mîxabîn em hemû ji spêde ta êvarî çend alozîyên bê me'ne û karên bê qazanc ve mijûl in.

Lî dûmahîyê ji em dê dubare bîkîneve lî ku dê bêjîn pêdivî ye mîrê kurd destê xwe ji van rewîşt û edetan berbîde û berê xwe bîde paşeroja mîletê xwe û hîzr û bîrên xwe dîke ka çawan dê bîçûkên xwe

bî rengêk dîrîst û baş xudan bîke, da dî paşerojê de bîbe endamek serêkî bo pêşkevîna mîletî û bînyatnana wî.

DU JIN DI MALEKÊ DE

Heger du jin kevîna malekê de, vêca ew her du jin çî hewî bîn, çî jîntî bîn, çî jînbîra bîn, an jî bûk û xwesû bîn, pêdivî ye pêkve bîn, çûnku gelek caran ew jîna pêkve gelek venakêşe, an jî gelek dî gel yek na mînin, lê hindê caran jî ew herduk pêkve dîmînin. Vêca dîvêt cudahî dî malê de ne keve, pêkve bîjîn û çî nexweşî lî navbera wan peyda ne be. Heger hebe jî, zû bî zû bête veşartî, da ku herdu feyde jê bîbînîn.


Jî mîj e bab û bapîran gotîye ku 'ew mala şer û qîr qîr ketê cejnem e û ya bînbîr e', jî ber vê çendê çî tîre nîne heger yek jî ber ya dî dane, yan yek guhê xwe bîde ya dî û her gav xweşî û dîlovanî dî malê de hebe. Helbet ew mal gelek xweş dîbe û herdu la, yan herdu jî faydeyê jê dîbînîn. Çê dîbe gelek dîbêjîn ku ev çend e na be û gelek bî zehmet e. Em dê bersîva wan bîdîn û bêjîn ku berî noke lî gundan pîtır jî du jînan dî malekê de bûn û gelek caran jî dî malekê de ne dîgehîştîne şeş ta heft jînan, vêca çî bûk ban, yan jîntî ban, yan jînbîra ban û hwd.

Jîyana vê malê lî gundan xweş bû û rêzgîrtîna hebû, bo çî berî noke çê dîbû û noke çê na be? Lê heger vîyan hebû dîş û jînbîra, yan bûk û xwesû dê pêkve bî xweşî her dem bîjîn.



"Derdname"

ya Fatma BOZARSLAN



DERDNAME navê berhema yekemin ya şaira hêja Fatma Bozarслан e ku çendek berê li Swêdê derket. Fatma Bozarслан, xanuma nivîskarê kurd M. E. Bozarслан e. Em ê ji wê çend nimûneyan li vir pêşkêşî xwendevanan bikin. Em bewer dikin ku xwendevan wê ji helbestên "DERDNAMÊ" hez bikin.

Dî wan da dayika delal BOZARSLAN bi kurdiyêke zela û sîvîk derdên dayikên kurd, hesreta welêt; zîlma dewletên dagirker ên Kurdistanê bi hêza helbestê tine zîman. Ew li ser zîlmê, li ser neheqiyê-lî kêdera dinyayê dibe bila bibe - dengê xwe bilind dike. DERDNAME ji 80 helbestan pêkhatiye.

EZ LI XERIBIYÊ DILÊ MIN LI WELÊT

*Ez li xeribiyê dilê min li welêt, li gula welatan
geh dibe kevokek, difire li ser zînar û latan
geh dibe baran, dibare li gul û nebatan
geh ji dibe dar, si dide ser civatan*

*Carna dibe hewrek, digere li ser bajar û sûkan
carna dibe xerzek, guh dide wite-wita çûkan
carna dibe teyrek, dinêre li leyistika zarûkan
û guhdari dike li stranên keç û bûkan*

11.02.1995



STRANÊN BAYÊ PAYIZÊ

Ax westiyaye û razaye
Stranên hezin dibêje bayê payizê
Ji pelên daran ji tê dengê saz û sazbandan

Ew pelên zer hemi diweşin
û wek temeziyên rengin
Lî rûyê erdê direşin
Lî rûyê wê axa razayi
dibin perde ew pelên zer
û didin rûyê axê rengê zer

13.10.1995

TIKA JI ÇIYAYÊN KURDISTANÊ

Ey çiyayên Kurdistanê, zû bihelinî wê berfê
Bîla dî ser wan xatûn û bûkan da buhar zû bê
Bîbin dalde lî ber bayê
da ku neqefîlî dayikên cîwan lî ser rîya revê

Ew zarûkên dî hembêzên dayikan da hemî
gul û kulîkên wê axê ne
Bîla nepelîsî lî nava wê berfê
Gelek bav û bapîr jî bûne gorî jî bo wê axê
Ey çiyayên Kurdan
Mebî çiyayên derdan
xwe mekî gor jî bo zarokên Kurdan
Meynî kêfa wan hovên çolan

Nisan, 1991

Qadi Şero

Muzikvanê Mirê Botan

B. Botani

Lı her cıheki ji cihên Botan serokêlek Lhukum dıkır, ev hemû cihên serbixwe, girêdayi mirê Botan bûn. Lı Deşta Mişarê mirovek bi navê Kako (Kakıl Axa) hukum dıkır, ewi gelek ji muzikê hez dıkır, ji lew re li der û dorê wi mişe sazpend, dengbêj û semavan hebûn; Qadi Şero û Baro du kes ji wan bûn û mişeyên di... Hingê zıkreşi di civata kurdi de her bê sınûr hebû, di ser hindê re di navbera serokêl û Mirê Botan pırsgirêk, nexweşi û netêgehıştın ji hebûn...

Carekê Mir Şeref Mihemed Evdali فرمانek derxist û got:

- Kesên ku nızanın û nıkarın helbestan bixwinın, yan li amûreke muziki bijenın û bıstırın, bila ji Botan derkevin! Yê ku di vi wari de jir û jêhati bin, divêt mirov rêza wan bigre û destê harikariyê ji wan re dirêj bike!

Tête gotın ku li ser vê فرمانê, çend binemal ji Botan hatine derxistın û dûrxistın...

Lı diwana Kakıl Axayi mişe ahengên rengin dihatine berhevkırın, Qadi Şero ji roj bi roj xwe pêşdixist û navê wi li cihên di ji belav bû, ev peyam gehiştê Mirê Botan, ewi ji, ji Kakıl Axayi xwest ku Qadi Şero bête Cızira Botan û li Burca Belekê muzikê bijene. Dema ku ev peyam belev bû, hunermendên di pê şad ne bûn û da ku Qadi Şero ne gehe armanca xwe, ew he-

mû jê re bûn asteng, paşê Baroyi rewşa xwe di navbera xwe û Kakıl Axayi xweş kır, ew ji da bwarê li Qadi Şeroyi bête girtın... Lê Kakıl Axayi guh ne da çı kesi û ji bo berjewendiya xwe Qadi Şero şande Cızira Botan.

Qadi Şero di gel sê corên tenbûre çû Cızirê, ewi bi evinek û vıyaneke mezın li Burca Belekê muzik jeni û Miri ji morka jenina wi gelek kêfxweş bû û ji wi razi bû. Qadi Şeroyi gelek bala Mirê Botan kêşand, ji lew re Miri gelek rêza wi girt û ew xelat kır, di ser hindê re pere û zêr wergirtın... Paşê Qadi ji vegeriya Deşta Mişarê.

Lı gor kevneşopên cihên devera Botan, pere, xelat û diyariyên ku mirov werdigere, divêt di gel serokêlê bêne dabeşkırın. Dema Kakıl Axayi behra xwe xwest, Qadi Şeroyi ne pejirand. Bi ûştta ne pejirandina wi, di gel zıkreşiya Baroyi û çend hunermendên di, hişt ku gelek zıyan bigehe Qadi Şeroyi; Kakıl Axayi tiştên Qadi Şeroyi bi zorê wergirtın û ew havête zindanê...

Qadi heyamek di zindanê de mabû, paşê azad bû. Ewi weke berê ne kari ku li ser karê huneri bijit, ewi dest bi karê rêgri kır...

Carekê Kakıl Axayi ji pê zani û gelek hers bû, êdi ew û nobedarên xwe çûne

Qadi Şero 2



- Hey bēnamisê bēnamisan! Em 'ê kengê ji te û ji binemala te rızgar bin?

Qadi û du hevalên wi hatine girtin û kevtine zindanê, lı ser fermana Kakıl Axayi, nobedarek ji nobedaran du momên hilkiri danin ser du milên wan û bı vi awayi hatine eşkencekirin... , Haya Mirê Botan ji Qadi Şeroyi ne bû, rojekê ewi vê peyama nexweş bihist û dı cıh de Kakıl Axa seza kir. Wesan ewi biryar da ku ji bo dermankirina Qadi Şeroyi du birindarên di binine Cızirê, lê ji ber birinên kûr û dijwar, Qadi Şero bı rê de mır û lı teniştı Ava Dicleyê termê wi hate veşartin. Du yên di ji gehiştine Cızirê û pıştı demek birinên wan sax bûn...

Ev bûyer belkû dı çerxa 16 rûda, ji ber ku tête zanin ku Burca Bellek Beri hıngê hate avakirin, *bı kurti 1596 ji aliyê Xan Mir Evdali hate avakirin

perrê gundi da seh bıkın û bı çavên xwe ji bıbinin... Qadi û du rêgirên di lı nav daristanê bûn, Kakıl Axa û nobedarên xwe ji xwe hêdi hêdi niziki rêgirın kırın, rêgirın zani û Qadi têkçû, dı cıh de ji, jına Qadi Şeroyi dı gel jinên di ji kaniyê divegeriyane malê û haya wan ji bayê felekê her ne bû, ewê ya ji wê ve mêrê wê dê bıçe Diyar Bekrê, bı dengeki bılınd gazi kire wi:

- Ho ho Qadi! Tu j' bir ne ke, cılên cıwan j' Diyar Bekrê j' mın ra bine!.

Qadi hêrs bû û got:

- Jinê! Hışê te, hışê Kakıl Axayi û hışê kirê mın yek e!

Kakıl Axa har bû, nobedarên wi Qadi û du hevalên wi girtin, jına Qadi Şeroyi ji seyrmayi ma, her ne zani ka çı rûdaye û gote Kakıl Axayi:

Muzika Qadi Şeroyi

Parçeyên muziki yên Qadi Şeroyi ta noke ji lı Devera Botan û Mêrdinê têne bihistin, nemaze ji aliyê tenbûrvan û ûdvanan têne pêşkêşkirin. S.Yûsif û Î.Temo parçeyek lêxistine; parçeya Seidi lı Mêrdinê tête bıkaranin û ya Temoyi lı başûra Botan belav e... Ez dı gel vê gotarê parçeyekê jêr navê "Qadi Şero 2" belav dikim.

Jêder

1- Babê Ibo

2- I.Temo

3- S.Yûsif

4- * Özgür Gundem, 24-7-1993 h. 89, r.12, Mustefa Aydın, İstebol.

Zımanê stranan

Mehmet BAYRAK

ÊVAREKÊ em li mala dosteki rojnamevan rûniştine. Ev heval bi xwe ji kevneşopiya çepên berê tê. Kasêtekê dixê teyibê. Muzika ku ji stranên hêla Elezizê pêkhatibû çawa destpê kir, wi hevali ji dest bi gazinan kir.


"Yahû, wan rojên han ez di MED-TV ê da skeçeki temaşe dikim. Aktoreki skeçê bi tirkî stranekê dibêje, yê li hemberi wi;

-Aaa, ew strana me ye û eslê wê kurdi ye, dibêje û dibe mîze-mîza wi.

Aktorê din dest bi straneke din dike, di-sa eyini bersiv, eyini mîze-mîz bi kurdi. Ev çawa dibe, ji bo xatirê Xwedê, ma zımanê stranan ji dibe?.."

Ev heval fêrbûye, heta niha bi navê enternasyonalîyê li her tiştî bi barçavkên tirkî binêre, ji bo ku ez erza wi neşkênim min bi kurtî weha jê ra gotibû:

"Min bi xwe ew skeça MED-TV temaşe nekiriye. Lê wek niviskareki ku li ser çanda geli û nemaze li ser beşê wê yê stranên geli xebitîme û bi edebiyat û hunerê va eleqeder bûme, dikarim weha ravebikim: Her şaxeki hunerê çawa xwediyê zıman û şeweyên gotinê ên muşterek in, wisa ji xwediyê zıman û şeweyên gotina xwe ya xweser in ji. Û nemaze dema gotin li ser edebiyata devki be, hingê



Lêkolîner-nivîskar
MEHMET BAYRAK

ev rasti bêtir xuya û zelal dibe. Li aliyê din wexta gelek endamên gelên pîr ji hev cuda ji ji berhemekê zewqê bigrin, av nayê wê manê ku zımanê wê afrandîna huneri nine. Divê qet neyê jibirkirin, rîya ku diçe gerdûniyê, di netewatiyê ra derbas dibê. Paşê wek lêkolînerê ku hîm antolojiya stranên geli ên tirkî, hîm ji ji bo cara yekemî antolojiya stranên geli ên kurdi derxistiye, ez dikarin bibê-

jim; stranên kurdi ku heta niha di binê ipotekê da bûye, beşeki mezin jê hatine wergerandin, guherandin û wek stranên tirkî tîne pêşkêşkirin. Yani evana stranên kurdi bi zımanê tirkî ne. Nîmûneyên ku di vê kitêbê da ci girtine, vê rastiyê nişani me didin. Ev pirtûk di dewra 70 salên komarê da cara yekemî bû derket, lê hat komkirin û bû ûştê (gerekçe) cezakirina min. Berê, ji ber ku li ber me tu berhemên nivîski tunebûn, eger me hîzîr bîkîra ji, nikaribû derxista şîûrê. Lê iro bê hejmar nîmûneyên vê hene di destê me da. Bêguman dema ku du xelk bi sedsan li tenêştê hev bîjin, bîvê nevê ew herdu kultur û kulturên din li hevdu tesirê dikin, bi vi awayî nemaze di warê muzîkê da stranên tîkîl hev derdikevin meydanê. Lê stranên geli yê kurdi, ne bi awayê danûstandinê, tenê bi standîna yekalî û bi wê ipoteka ku li ser heyê berx-

we dîdîn..”

Ev şîrovekîrîn lî xweşa vi hevalî neçû. Neçû jî ber ku fêrbûye bî navê enternasyonalîzmê lî hertştî bî berçavkên tîrkî mêze bîke. Şeva me ya ku bî xweşi dest pêkiribû, bî nexweşi dawî anîbû..

Bî rasti jî em fêrnebûne ku bî hîşekî azad lî ser tîşt û bûyeran nîqaşan bîkîn. Em navê sosyalîstîyê, enternasyonalîstîyê bî xwe va bîkîn jî, dî rastiye da em dî binê tesîra siyasetên kultura kemalist da bûn. Mêjiyên me bî dîtinên kemalîzmê hatîbûn çîterkîrîn. Jî ber ku çepîtiya me jî dî eslê xwe da jî mahreça kemalist û tîrkî bû. Gelek caran, bêyî ku em wê bîzanîbîn, bînasîn me lî ser kultureke qedexekîrî hukûm dîda. Me ne jî bo rûberîhevkîrîne tu xabat kirîbûn, ne jî dî vî wari da pîrtûk xwendîbûn.

Hîna dî salên 1970-yî da, wextê ez dî TRT (Radiyo û Televîzyona Tîrkîyê, NW) da dîxebîtim, mîn bî Nîzametîn Arîç ra û bî hîn hevalên dîn ra lî ser vê meselê qîse kirîbû, lê mîn ew hîzrên xwe derbasî ser kaxez nekîrîbûn. Paşê heta ku mîn kovara Özgür Gelecek û antolojîya Klam û Stranên Kurdî derxîst. Tîşteki balkêş e, hîm nîvîsa mîn a bî navê ”Çanda kurdî û politikayên asimilasyonê dî pêşdaçûna dîroki da”, hîm jî ev kitêba mîn hatî komkîrîn û cezakîrîn. Herçend mehkema wan lî dor 500 heb jî wan stranan wergerandîne tîrkî û tesbîtkîrîn ku ew hemû jî stranên evîni û bengîniyê ne, dîsa jî ew hatî komkîrîn û cezakîrîn...


Dî sala 1989'a da, bî navê Mehmet


Korkmaz hevaleki minê Diyarbekri ê rojnamevan, dî kovara Metro ya wê dewrê da lî ser vê pîrsê nîvîseke gelekî balkêş nîvisandîbû, û gelekî deng dabû. Dûra mîn ew mîqala wî ya bî navê ”Navê Cot standardîyê: Bî eslê xwe kurd bî gotîna xwe tîrk” girte nav kitêba xwe jî. Dî wê mîqalê da, wî gelek jî stranên kurdî bî navên xwe yêni eslî, û jî alîyê kîjan hunermendê kurd va tîne gotîna, û kê wergerandîye tîrkî, bî çî navi û jî alî kê va bî tîrkî tîne stranîna, hemû bî awayekî rûberhevkerî dîda. Pîraniya wan stranan, dî serî da jî alî İzzet Altınmeşe, gelek kesan va bî zîmanê tîrkî hatîbûn veçêkîrîn û gotîna.

Strana ”Ey Fırat Fırat” ya ku Şîvan dîbêje, ”Ez kevok îm lê lê” ya ku Hesên Cîzrawî dîbêje, ”Diyarbakır Paytext e” ya ku Seîdê Hemo dîbêje, û yêni anonim wek ”Gulîzer”, ”Dayka mîn”, ”Lê Nazê, Lê Nazê”, ”Berçem berçem dîçûme” tenê hînek jî wan îna, yêni ku jî alî dîzek û derewkar İzzet Altınmeşe va bî tîrkî tîne strandîna. (...)

Dîvê em jî birva nekîn ku kes derewan dîkîn, lê stran tu wextê derewan nakîn!.. Û dîsa em jî bir va nekîn yêni ku stranên xelkeki çêdîkîn, jî yasaçêkerên wî xurtîr în!..

Nwîs jî rojname Hêvî, hejmar 14, hatiye wergerîna û jî tîrkî hatiye wergerandîna. Temamîya nîvîsê ne evqas e, lê jî ber tengasiya cî me beşek jê derxîst.





ZEVIYA ZIMAN

Lêkolin, raman, rexne, pêşniyaz

Hejmar

SIDQÎ HIRORÎ

Ez dixwazim vê carê, ji hejmaran, bes li ser tewandina salan û rojên mehê rabîwestim. Mebesta min ji vê hilişkafînê ew e ku bi pêşniyazekê ji bo çawa nivîsandina rojên mehê û salan di zimanê nivîskî de derbîkevîm. Ez di vê hilişkafînê de di navbera gramera C. A. Bedîrxani û devoka Behdîniyê de li alternatîvêka hêsantir û hevbeştir digêrîm û ji ber hindê ez bi ditînên Bedîrxani li ser vê pîrsê dest pê dikim.

Hejmara rojê û salê di gramera C. A. Bedîrxani de:

1. Yek: çî bi tenê be û çî ji bi dawîya hejmarekê ve be weki navê mê bi "ê" dihêt tewandin; mina:

Dî yekê Gulanê de

Sala 1921ê

Sala 1891ê

Û her weha li gor vê bîngê ew di pirtûka xwe ya hevbeş digel "Roger Lescot" di minakên li ser rojên mehê de, yekê ku bîserka wê hebe, weha dinivîse:

Yeka Gulanê

Weha bo me xuya dibe ku li gor gramera Bedîrxani yek bi "ê" û "a"yê dihêt tewandin.

2. Ji hejmara 2ê heta 20ê mina navê bîser yê gelehêmar bi "an"ê dihêt tewandin; mina:

Sala 7an bz

Sala 1920an

Sala 1922an

Sala 1995an

Lê C. Bedîrxan rojên mehê bi "ê"yê dîtewîne; mina:

2ê Îlonê

7ê Tirmehê

24ê Gulanê

Em bi vi awayî dibînin ku hemî rojên mehê, ji bîli yekê (ku bi "a" û "ê"yê dihêt tewandin) bi "ê"yê dihên tewandin.

3. Hejmarên dehîni ji 30ê û pê da; 30, 40, 50, 60, 70, 80, 90, 100, 130, 500, 1000, mîlyon û htd. weki navê nêr yê yekhejmar dihên tewandin; mina:

Sala 1930î

Sala 1860i
Sala 500i
Sala 1000i

Ev ji aliyeki ve, û eger em ji aliyê dîn ve ba-
la xwe bîdîn ser devoka Behdînan, em dê
bîbînîn ku hem peyva hejmarê û hem gişt
hejmarên bîngihin (yên matematîkê), kî
bî kî mê ne, her weki dî berçavxistina jê-
rin de:

Hejmar	Mamoste hejmarê dînvise
Yek	mamoste yekê dînvise (mebest jê hejmara yekê ye)
Du	mamoste duyê dînvise
Sê	mamoste sêyê dînvise
Çar	mamoste çarê dînvise
Pênc	mamoste pêncê dînvise
Şeş	mamoste şeşê dînvise
Heft	mamoste heftê dînvise
Heşt	mamoste heştê dînvise
Neh	mamoste nehê dînvise
Deh	mamoste dehê dînvise
Yazde	mamoste yazdeyê dînvise
Bist	mamoste bistê dînvise
Heftê	mamoste heftêyê dînvise
Bist û Yek	mamoste bist û yekê dînvise
Sed	mamoste sedê dînvise
Sed û yek	mamoste sed û yekê dînvise
Pêncsed	mamoste pêncsedê dînvise
Milyon	mamoste milyonê dînvise

Weki em dibînin tewandîna wan ji li gor
mêjera yekhejmar ya mê bî "ê"yê hatine
tewandî, jî ber ku behsa yekhejmarê bî
tenê dihê kîrin. Dema mirov dibêje "ma-
moste sedê dînvise" wê gavê em weha
têdîgehî ku mamoste yekhejmarê bî tenê
dînvise û navê wê sed e. Û bo gelehejma-
ran, hemû hejmar weki navên nêr û mê bî
"an" dihên tewandî, mina:

Mamoste hejmaran dînvise
Mamoste sed milyonan dînvise

Lî gor minakên jorin xuya dibe ku hejmar
mê ne û ew lî gor bîngiha giştî ya te-
wandîna navên mê dihên tewandî û jî bo
baş naskîrîna tewangên wan, em dikarin
temaşayi hejmara yekê û tewangên wê,
weki nîmûneyeki lî ser tewanga hejmaran
bîkî:

Yek hejmar e
Yeka mîn cîwan hat nîvîsandî
Yekeka cîwan bînvise
Yekê bî cîwani bînvise
Hejmara yekê weki tîlekê ye
Dî yekê de

Sal bî xwe jî beş e jî demê û dem jî bî he-
mû beşên xwe ve mê ye: vê rojê, vê şevê, vê
nîvroyê, vê êvarê, vê spêdeyê, vê gavê, vê
demê, vê çaxê, vê deqîqeyê, vê çîrkeyê, vê
seetê, vê qonaxê, vê heyamê, vê mehê, vê
demsalê, vê salê, vê sedsalê.... ûhd. Ev be-
şên cuda yê demê jî mina hejmarên
bîngihin û navên mê dihên tewandî.

Ku em temaşayi herdu pîrsyarên jêrin
bîkî, jî me re baş yekhejmari û gelehejma-
riya pîrsyarê xuya dibe:

Dî kijan (kij) salê de?
Dî kijan (kij) salan de?

Ku me guh lî salê dibe em dîzanî ku ew
qala salekê bî tenê dîke û tewanga zayen-
da mê ya yekhejmar jî pê ve dîyar e. Û dî
salan de jî ew qala gelek salan dîke û tew-
naga gelehejmariyê jî pê ve xuya ye. Evca
çûma dî bersivê de lî ser pîrsyara yekemin,
ya ku mêjera wê yekhejmar e, mirov dê

bersivê bî mêjera gelehejmar bîde? Çima mirov di bersivê de li ser kijan salê dê bibêje sala 1994an? Ma qey an di ziamnê me de, ne ji bo gelehejmariyê ye?! Çima mêjera bersivan ji li gor mêjera pirsyaran nabe? Ku pirsyara kijan salê ji me bihêt kîrîn ji ber çî bersiv ji weki wê nabe: sala 1994ê? Nê mebest jê yek sal e ji salên notan ku navê wê 1994 e. Çima ku pirsyara kijan salan hat kîrîn, bersiv ji weki wê bî gelehejmar dihêt dan: salên 1990an? Ji ber ku ji mêjera wê diyar e ku ew behsa gelek salan dîke û mebest jê ne yek sal e ji salên notan lê deh sal in; ji sala 1991ê heta sala 2000ê.

Hinek kesan di munaqeseya xwe digel min de xwest bibêjin ku gotina min ku hejmar mê ne nerast e û belgeya wan ji hejmara rojê ye di hevoka jêrin de:

01.05.1920

Yekê Gulana 1920ê

Ew dixwazin bibêjin ku yekê weki navê nêr yê yekhejmar hat tewandin û ji wê bingehê ya ku dibêje ku hemû hejmar mê ne derkeft. Lê ez ne bî vê şirovekirina serveyi re me. Bî lênerina min navek li pêşiyê ya yekê ye û bo kurti û sîvîkiyê jê ketiyê û ew bî xwe di rastiye de weha ye:

Roja yekê ji Gulana 1920ê

Em dibinin ku roja ji pêşiyê yekê rabûye û daçeka ji ji pêşiyê Gulanê rabûye û weha dema ku yekê Gulanê bî ber guhên me dîkeve, em dîzanin ku mebest jê roja yekê ye (roja yekemin e) ji meha Gulanê. Xwe eger em hejmara 1920ê bî tenha serê wê, bê tewandin û weki hejmareka bingehin bixwinin dê weha be 1920 (hezâr û nehsed

û bist). Em li vê derê dibinin ku ev hejmar bê tewanga "ê" hat nivisandin û bilêvkirin. Ji bo ku tewanga "ê" yê bîkeve paşiyê wê divê ew hejmar bireser be û ya ku bî serê hejmara salê (navê salê) dihêt ev bireseriya wê ye ku wê ditewine û tewanga navê mê yê yekhejmar yê bireser bî paşiyê wê ve dîke û eyni pîrsê bî yekê û rojên mehê ji re rûdide. Û bo bêtur rohinkirina vê pîrsê em dikarin tên bîdîn vê hevoka jêrin:

Keça Gulistanê ji malbata Xemê

Ku em bîzanin ku peyvên (keç, Gulistan, malbat, xem) peyvên mê ne, wê çaxê em dikarin têbigihin ka çawa yekê Gulanê di rastiye de roja yekê ji meha Gulanê ye.

Di warê sedsalê de ji her eyni reftarê digel dihêt kîrîn, lê di navbera du alternatîvan de:

Alternatîv 1

Sedsala 1-emin (yekemin)

Alternatîv 2

*sedsala
1ê (yekê)*

Sedsala 4-emin (çaremin)

*sedsala
4ê (çarê)*

Sedsala 20-emin (bistemin)

*sedsala
20ê (bistê)*

Sedsala 21-emin (bistûyekemin)

*sedsala
20ê (bistê)*

sedsala 30-emin (sihemîn)

*sedsala
30ê (sihê)*

Û bî lênerina min ji zîmanê nivîski re alternatîva yekemin çêtir e.

Mêkirina hejmarên bingehin û hejmarên roj û meh û salan di kurdiya devki û nivîski de li Behdînan heye û wecên vê mêkirinê û bîkaranina wê di zîmanê nivîski de ev in:
-Bingeha taybeti ya sê xalki ya gramera C. A. Bedîrxani radibe.

-Lı şûna wê yek bingeh cihî digire û ew ji ev e: "Hejmar ji mina mênawan (navên mê) dihên tewandin".

-Weha hejmar ji ketin bin çengên bingehên gîştî yên rêzimanê kurdiya kurmanciyê. Û herweha rêziman ji bingehên awarte yên li destpêkê hatine binavkirin azad dibe û bi vi terzi ji bingehên gramerê kêmtir dibin.

Xwe eger em qala tîştan û canberan bikin wê gavê nêr û mêyiya yekhejmarê dimine girêdayî nêr û mêyiya tîşt û canberên ku dihêne hejmartin; mina:

Ji bo yekhejmariya zayenda nêr "i", û ya mê "ê":

Kureki (yek kuri) got yeki got
Keçekê (yek keçê) got yekê got

Ku hejmar bêtir ji yekê be, bi "an" dihêt tewandin:

Du kuran got duyan got
Pênc keçan got pêncan got
Bist û yek kesan got bist û yekan got

Hejmarên rêzki ji bi vi awayê jêrin dihên tewandin:

Kesê yekemin (kesê yekem)
yê yekemin
Kesê duyemin (kesê duyem)
yê duyemin
Kesê sêzdemîn (kesê sêzdem)
yê sêzdemîn
Kesê bistemin (kesê bistem)
yê bistemin
Keça bistûyekemin (keça bistûyekem),
ya bistûyekemin
Keça çardemin (keça çardem)
ya çardemin
Kesên yekemin (kesên yekem)
yên yekemin

Keçên pêncemin (keçên pêncem)
yên pêncemin

Yan ji:

Kesê yekê yê yekê
Kesê duyê yê duyê
Kesê sêzdeyê yê sêzdeyê
Kesê bistê yê bistê
Keça bistûyekê ya bistûyekê
Keça çardeyê ya çardeyê
Kesên yekê yên yekê
Keçên pêncê yên pêncê

Lê ev babetekê bi serê xwe ye û ez hêvidar im ku bibe mijara nivîseka min ya berfirehtir.

Cavkanî:

1. C. A. Bedîrxan, *Bingehên gramera kurmanci, weşanên Nûdem, Swêd, 1994.*
2. C. A. Bedîrxan û Roger Lescot, *Gramera zîmanê kurdi (zaravê kurmanci), wergerandina Dilawer Zenki ji fransiyê bo erebîyê.*
3. Hawar, kovar, C. A. Bedîrxan.
4. Ronahi, kovar, C. A. Bedîrxan.
5. Roja Nû, kovar, K. A. Bedîrxan.

Têbînî: Dî hejmara beri vê ya Roja Nû, di nûvîsa min ya bi navê "Eke û eki yan eka û ekê?", di rûpela 14ê, ji dawîya nûvîsê di rêza 15ê de şaşiyek hatiye kirin; peyva dengdar şaş e û ya rast bêdeng e. Daxwaza lêborînê li ser vê şaşiyê dikim.



Fêrikê Ûsiv ji cihanê bî xeyd çû!

Têmûrê Xelil

Gelek mîlet mirovên xweyi bî nav û deng dema saxtiya wan da pîr qîmet nakin, carna zorê ji lê dîkin, lê dû mîrinê ra wana mezin dîkin, qedirê wan dîgîrin, wan datînine çiyê bilind yê hêjayî wan. Lê em-kurd, pîrani ne dema saxtiyê û ne ji dû mîrinê ra wek pêwîst e kesên xweyi navdar qîmet nakin.

Fêrikê Ûsiv di 11'ê gulanê da li gundê xwe xatirê xwe ji jîyanê xwest, çû ser heqîya xwe.

Ji şikberiyê der e, ku Fêrikê Ûsiv sedi-sed ji helbestvanê kurdên Sovîetîstana berê yê herî navdar bû. Û çiyê wîyî bilind di nav hemû helbestvanên kurdên cihanê-da gerekê hebûya. Û şikberî tenê wêda

bû, ku pey wîra ki ye yê bî nav û deng? Şikoyê Hesên, Mikayêlê Reşîd, Qaçaxê Mîrad, Tosînê Reşîd, Eskerê Boyîk, Egitê Şemsî, Çerkezê Reş an yê dinê? Lê ew çawa dibê, ku pirtûkên wî li Sovîyetîstanê ji hemûya kêmtir çap bûne û li Awropayê û Kurdistanê ji hiç çap ne bûne? Ew ji wê demê, ku yê gelek ro-nahî ditîne. Ji wana gelek an sist bûne, an ji ne helbest bûne. Îcar em ê disa wek her cara ji derd û kula ra bîkîne qarîn û hewar-gazî, ku dijmin nahêle. Hiç eleqa dijmin li vîr tune. Eger dijminatî hebe ji, nav me da ne û sûc yê me ye.

Wek gelek helbestvanên bî talant û aqilmend, Fêrik ne minanî her kesî dîfîkîrî û mejû û fikrên wî ji gelek dîha-te cihêkrînê. Û gelek ji digot qey tiştêkî

wi kê m e, lê nizanibûn, ku gelek tiştên wi ji pîr mirova zêde bû. Hiç cara ew ji bo kara xwe, xwe ne difiro, hiç ne fikiri, ku bibe endamê partia komûnist, ku kareki bîlind bîdîne, hiç cara tehmûl ne dikir, ku dêmokrat û komnûnistên cihanê tişteke digotin, lê tişteke din dikirin, bawerîya xwe bi wan ne dîani, ji ber ku zanibû, ku gelê wi û welatê wi hêja ye serbest û azad be, lê her bîndest û bê dewlet e. Geleka li Soviyetistanê pirtûk çap dikirin ji bo perên mezîna bîstînan, lê wi dinivîsand, ji ber ku nikaribû nemîvise. Rewşa wi ne baş bû, ereba wi tunebû, kêf ne dikir, lê pîr dewlemend bû-bî ruhê xwe, bî dilê xwe, bî jiyana xwe...

Gava bavê min serokê radiyoya kurdi bû li Yêrêvanê, Fêrik li wîra serwêre perça litêtatûrayê bû. Nava sala dereca edebiyetê di radiyoyê da pîr bîlind bû. Ew bû bîngeh, ku nava kurda da helbestvanên baş derên. Fêrik herweha di piê-sên (şano) radiyoyê da ji wek artist dileyîzî piyeseke baş ji nivîsi- "Bê qelen". Mala wi wan dema li Yêrêvanê bû. Bermalîya wi Fîrîde-keça Heciyê Cîndî, mamostaya komarê ya emekdar û navdar bû. Lê usa qewimî, ku Yêrêvan ji wî ra biçûk bû. Ew tin û agirê dilê wî helbestvanîyê nav wî da dikeliya, lê ne dida der, ji ber ku ew kesên, ku destûra çapkirina pirtûkên kurdi dabûne wan, pîr cara Fêrik înkâr dikirin û çap ne dikirin. Sê sebebên wê hebûn: Dî hêlekê va fê m ne dikirin, dî hêlekê va hevîdî dikirin, dî hêlê va ji dewsa wan pirtûkên xwe, bavê xwe, jina xwe û hevalên xwe çap dikirin....

Û Fêrikê Ûsiv dîxeyîdî, ber xwe dike. Rojê ji, rabû berê xwe da gundê xwe-Sîpanê (li Ermenistanê) û gelek sala li wir ma, dibîstana gund da bû mamostayê zîman û litêratûra kurdi... heta roja mîrîna xwe. Vîra bîna wî fire bû, ew xwe wek di perçeki Kurdistanê da didit. Gundê kurda, erf-edetê kurdi, deb, kolorit û

tîmtêla mîlet, def-dewat, şîn-şayi, çiyayên bîlind, kalîna pêz, gotinên kal-bavaye bî sal-dewrana... Erdek danê, bî destê xwe xanî çê kir, dorê sûr kir, çend kar û berx kirin, xwedî kirin, xwe nêzîki jiyana kurdîyê kir.

Usa qewimî, ku min ji dev ji Yêrêvanê berda (ez wî mezîna bûme) û sala 1974-a çûme gundê Fêrik, dibîstana bûme mamostayê matêmatîkayê. Hatîme kêleka Fêrikê Ûsiv. Ez vê fikrê dîxwezîm ducar bikim. "Hatîme bal Fêrik". Ew sê salên min yê xebata di dibîstanêye tevayî ji bo min bûne salên têgîhiştîna rastîyê, bextewarîyê, paqîjayê. Carna min û Fêrik sergin, patete hîldîda diçûn ber "Kaniya Beko", serê çiyê, me agir dadîda, patete davîtê, û Fêrik helbestên nuh dîxwendin. Berga fireh, hewa paqîj, dilê rehet, dengê bîlûra şîvên dibûne bîngehê helbestên nuh. Û çî mîxabîna, ku gelek ji wana çap ne dikirin. Tenê dîxeyîdî... Ne ji kesa, lê ji bextê gelê xwe...

Min gund da hevtê 5 roj ders dida, 2 roja ji diçûm mal-Yêrêvanê, nava jîn û zara. Gava vedîgerîyame gund, Fêrik pîrs-pîrsyara kurda, Kurdistanê dikir. Şa dibû, ku tişteki baş dibîhist û acîz dibû, ku rewşa Kurdistanê xirabtir dibû. Û dîxeyîdî... Ji siyaseta Soviyetistanê hîndava kurda da, bêdengîya cihanê û dutîretî-dubendîya navbera partî û rêxîstînanê kurda da. Û ser van mesela dîefîrand, dinivîsand, "Xemên xwe didane bêriyê" û ser kaxez rêz dikirin. Bî wê yekê parça dilê wî hîneki datani.

Gava sala 1975-a helbestvanê mezîna Şîkoyê Hesen li Tîbilîsîyê çû ser heqîya xwe, ez û Fêrik rabûn, me berê xwe da paytextê Gurcîstanê, ku "xatîrê xwe" ji Şîko bîxwezî. Fêrik rêda helbestek nivîsi derheqa Şîko da û li gorîstanê xwend. Helbesteke kûr, ji dil, ku têda kar û zêna Şîko xuya dikir. Dû xwendîna ra pîrê hevarîya (weke 500 kes) helbest fê m ne kirin. Lê Ezîzê Îsko ji helbestek xwend,

ku ser Şiko nivisi bû. Gışka fêm kırım û bû kûrriya wan, gıryan, Fêrik acız ne bû, tenê ber xwe ket, ku milet wi ténagihije. Û vıra tıştek dikeve bira mın, ku hinek parti-rêxıstın dibêjin: “Pirê milet bi me ra ne, tê wê manê, ku em rast in”.

Na, ne usa ne. Ne her demê, ku pırani rast e. Kurmanci dibêjin: “Pırani zora rastiyê biriye”.

Fêrik ji ronakbirên xwe yên rast-durust hıız dıkır, qımet dıdayê. Pey mırına bavê mın ra Fêrik çarxetek nivisi, ku me ser kevirê goristanê terışand:

*Ev Xelilê Çaçane-lı vir
Pal daye bê deng û hes,
Yê ku belayi dmê dıkır
Kêlm û kılam, deng û be`s.*

Lê ser şına bavê mın gotına xwe got, ku em li jêr perçek jê tinin:

“Me geleka dilê xwe da dıkıre dımim, ku emê hela gelek şayi-şayinetrya da rasti Xelilê Çaçan Mıradovê hıızkiri bên, bengz û beşera wiye xweş bibinin. Lê iro em şına wi dıkın. Tevi gelek tehli-tengryê jıyanê derbek ji li me û çanda me ket. Belê, em ê ji bımırın. Lê hergê rastryê ruh diji, em hêvi dıkın, ku wê dmê ruhê me rasti ruhê Xelilê Çaçani ezizi bine... Pirtûkeke wi bê çapkiri maye. Ronahiditına wê dı mırına Xelilê Çaçan re, wê bibe heykeleki zêndi ji bo biranına emekdarê litêratûra me...”

Ez bi xwe ne dındar ım. Lê minê gelek bıxwesta, ku bi sêr û ecêbekê ruhê wan “wê dinê” rasti hev bıhata.

Gelek cara meri dıkare bi helbestekêva ji navdar bibe. Em bımhêrın, ku çawa Fêrikê Üsiv nava van xeta da bextê milet, neheqıya dijmin, hêrs û ink, daxwaz û armanca xwe daye rêzê, û ev helbest hiç cara, hiç cıya çap ne bûye.

“HÛN ŞAŞ NEMİNİN...”

*Çendık û çend sal mame kerr û lal,
Weke ku komira bê zıman û zar li bınerdê sar*

Lê iro, feqet, iro ku eger gumin ji mın bê li ser vê dıkê,

*Jı agrê hundır bışuxulım gurr-gurr,
Hûn şaş neminin, hûn şaş neminin...*

*Çendık û çend sal, çend bıhar-payız,
Qaz-qulinga ra ne qûryame zız,
Baskhem ne kırıye mın Cûd û Erbil,
Û Sis, û Sipan, Serhed û Sıbil,
Û eger iro qırinkım qazki,
Perr bıgrım yekser, bıfırım fıraqski,
Hûn şaş neminin, hûn şaş neminin...
Ev destên han merd, destên şîernıvis,
Vê dewra nemerd nebûne kergidê porê qısmi qız,*

*Ku iro hevıxım wek kevir-hesta
Agr bıpekın li ber van desta
Hûn şaş neminin, hûn şaş neminin...*

Ev çavên hewce, weki ne dine ew bax û baxçe,

Ew çıya, ew bani, çıya ji kubartır bejna Barzani,

Eger mışkêva Dicle û Ferat bılqınkın, bıqşın ji herdu çava,

Hûn şaş neminin, hûn şaş neminin...

*Lê eger feqet, li rêkên emır teng û fıre-
qet,*

Milê mın da tûr, dınc û dinêdûr,

Wek parsekçiki li guhê gunda,

herım xalıfi, belengaz, unda,

Hûn şaş bıminın, hûn şaş bıminın...

Dijmın û neyara, xêrnexwaz û ruhbiçûka gelek cara Fêrikê eziz xeyidandine. Lê destûra ronakbir û weletparêzên rast tune vê yekê bıkın. Lema ji gerekê pirtûkên wi yên çapkiri û çapnekiri bıbine milkê gel.

Têmûrê Xelil

18.06.1997 Moskow

FÊRIKÊ ÛSIV

FÊRIKÊ ÛSIV di sala 1934'a da li gundê Pampê (Ermenistan) bûye. Xwendina navin û Institutûta pedagogiyê li Yêrêvanê kuta kiriye.

Çend salan li radiyoya Yêrêvanê beşê kurdi da kar kiriye. Gelek salan li dibistana gundê xwe dersên kurdi daye.

Gelek berevokên şîrên wi derketine.

Ji van:

"ÇAVKANI", "LIRKA", "ÛSIVÊ NEVIYA", "NARÊ", "DINYA DELAL", "HIVERON" û yên mayin.

Em li jêrê du helbestên kurt yên FÊRIKÊ ÛSIV, ku me ji "Almanaxa Kurdi" girt, pêşkêşî xwendevanên xwe dikin.

*Bira xwezîl Kurdîstana min şên bibûya,
Miletê min aza, xwendî û zên bûya,
Derge-diwan bî zîman û zarê min bûya,
Qewm û mîlet li her car hewarê min bûya,
Bira hingê ayê şevê li min carbûya,
Kelefeki wêran min ra ci-star bûya,
Qerpaleki reş li stûyê min da xarbûya,
bira gêzik dergevana destê min bûya,
Soqaqeke El-Cîzirê "posta" min bûya..*

*... Qurn û dewr û sal-zeman
Heyri bengzê te ez mam,
Kurd im, li ku yi Kurdîstan!
Wey dil û bîndesta min...*

Gotinên Pêşiya

Berhevkar:
Salih Omeri

Dîl şûşe ye, ku bişkê nacebire.

Dîl dîla dihebine.

Dîl dîleki dihebine.

Destê tenê deng jê nayê.

Destê rehet, lî ser zîkê birçî ye.

Destê ku tu pê nîkari; tê ramisi (maçiki).

Deve dî kotîkê de nayê avdan.

Du hesp dî afirki de naxwîn.

Dîlê xweş, hertîm bîhar e.

Dar nine ku ba lê nayê.

Dixum nan û av ez mînetî kesi hîlnayim.

Dermanê hertîştî xuwê ye, belê xuwêya bî xwe xîrab bibe dermanê wê tune.

Dewara nekîre meha Nisanê, jîna ne bijêre lî dilanê.

Derpê jînê sor e, mêrî wê kor e.

Dew lî mîrîba nayê.

Destê vala ne ahla û ne sahla.

Durrê bîde bî durrnasa.

Dê bû jîn bav, bav jî xwe bû zîrbav.

Destê lî ser desta heta esmanê hefta.

Dînya war e, ne newal e.

Darê stûr nabe gopal.

Da tu bîzani dew bîra yê mast e.

ÇEND STRANÊN FOLKLORİK

(3)

Berhevkar: M. LEWENDI

V- TEŞI

Teşiya te bî darê bî gûzê mî go ho zırav ho zırav ho zıravê
Teşiya te bî darê bî gûzê mî go ho zırav ho zırav ho zıravê
Bo tevn û teşyêt dayê mî go ho zırav ho zırav ho zıravê
Bo tevn û teşyêt dayê mî go ho zırav ho zırav ho zıravê
Çavkê xwe mî dit, dîlkê xwe heband, dilber meşya lî eywanê
Çavkê xwe mî dit, dîlkê xwe heband, dilber meşya lî eywanê

Teşiya te bî darê biyê mî go ho zırav ho zırav ho zıravê
Teşiya te bî darê biyê mî go ho zırav ho zırav ho zıravê
Bo tevn û teşyêt yarê mî go ho zırav ho zırav ho zıravê
Bo tevn û teşyêt yarê mî go ho zırav ho zırav ho zıravê
Çavkê xwe mî dit, dîlkê xwe heband, dilber meşya lî eywanê
Çavkê xwe mî dit, dîlkê xwe heband, dilber meşya lî eywanê

Teşiya te bî darê tuyê mî go ho zırav ho zırav ho zıravê
Teşiya te bî darê tuyê mî go ho zırav ho zırav ho zıravê
Bo tevn û teşyêt pirê mî go ho zırav ho zırav ho zıravê
Bo tevn û teşyêt pirê mî go ho zırav ho zırav ho zıravê
Çavkê xwe mî dit, dîlkê xwe heband, dilber meşya lî eywanê
Çavkê xwe mî dit, dîlkê xwe heband, dilber meşya lî eywanê

Ev stran lî hêla Hekkariyê tê gotm. Stran dî 1982'an de ji devê Mehemedê Culemêrgî hatrye girtm. Lî gor gotma wi pîraniya gundên dorhêla Hekkariyê ji vê stranê bî vi awayê jorin dibêjm. Meqamê sitranê nêzi Delîlo ye. Her rêzek wê du caran tê gotm, yek dibêje û yên din ji lê vedigerinm.

DAWÎ

Helbest

VAZGAL BAZIDÎ

SOFIYÊN NÛ

Ne stêrk ne hiv hebû
reşetariyek bî xof, xeter
ba û bahozeki sergêj dilorand.

Sofiyê me ji zîkrê serê xwe hilda û
got:

Ev ronahiya hanê ku şewq vedida
ji aliyê nediyar,
diyari ye, bo me !

Rabîn cemaet !

Mêzekîn, tirêjên ku ber bî me tê
rê nişan dîke, rabîne ser piyan !...

Secde lê bîkîn !

Xwe birçî hişt wek dewrêşan
serê xwe şikand bo rêberan,
heke lê bîqewîmiya
ewê ku mîrişk ji serjê nekîribû
dî temenê xwe da
dîkari bîkuştê gelek dê û bavan.

Bê pût nedîkari bîji !
Û ji xwe re pûtek çêkîr
bo secdê lê bîke,
bîbe sofiyek dîlsoz.

Çi bîkîm ?

Qumaş ev e,
jê dertê sofî û derwêş
Şêx û serok ji her pîr in
bê keramet û bê hiş,
Kerengê ber bayê ji gelek in
Lî kijan warê baran tê
konê xwe dîçîn lî wîra datînin,
nanê sêlê buyîn
ne tawan û gunehê wan e
qumaş û rêber ev in
yên çak hîn
ne xurt û hêz in.

02. 12. 1994 Dîkana Beko

KILIMKOTI

Jiyan kılomkoti ye dîbêjn !
Pisi nebe rındi,
xırabi nebe başi,
mırın nebe qedrê jinê nayê zanin.

Parçek ji derd û êş e
ya dın delali û xweşî
şer ji heye aşiti ji
kılomkotiye ev cihan.

Zereqa tavê, gava em nebinin
çı dızanın watê ronahiyê
û kor nebin çawa em bızanın
qedrê herdû çavên reşbelek.

dema tund û tûj û rêbir
pêsira merivan dıgrın
wi çaxi, tê bira me
insanên çak û qenc
bı rasti ji kılomkoti ye ev cihan !

Gırin, qêrin, hejari bêwext mırın
ma tenê para me ketiye ?
nızanım !
Spehi, bedewi û xweşbexti
gelo kingê wê were lı deriyê me xe ?
Ev gerdûna kılomkoti
wê kingê bo me ji çıraki vêxe ?

09. 11. 1995 *Dıkana Beko*

EVINA SISËYAN

Cara pêşin evindarê te bûm
hın ji bı gurbûna dilê xwe va
her berdewam e ew eşq.
Ey çiyayên bı berfên qerqaş va

xemlı,
newalên bı hestiyên rızı va tiji,
ey welatê minê bêşans û bê talih
tu dı dilê min da her biji !

Cara duduyan
Dayika Seyran bû...
Dı nav xewnên bê dawı,
lı ser riya dūrketinê,
û tatêleki bê mınnet da
derkete pêşiya mın !
Her evindar ım.
Hın ji qimiş nakım tûkime erdê
ku neçê tama maça pêşin
ji devê minê pırbêj.

Cara sısiyan çawa bû ?
Nızanım bı rasti !
Nuha tenê ew heye nabêjım
bes, nıkarım bê wê bijim.
Agirê sor bûye hebûn
sıtêrka rênışan
rındiya bêdawi
baweriyeki bêhempa bû
Evina mına nû.

Carna ji xewa gıran
carna ji xemên tiji bı baran
carna ji derdên bê derman
carna ji ji dewa bê guman
carna ji evina bê yaran
carna ji kulê bı tofan
carna ji şaşiyên bê halan
carna ji bê heval û hogıran
mın tine ser hışê xwe
ew geşt û seyrana mına nû.

14.02.1996 *Dıkana Beko*

ŞANO (TIYATRO)

ZEWACA ŞAŞ (2)

Bûbê Eser

PERDA DUDA

Perde vedibe, li hundirê odê tenê Salih û drya xwe li ser qoltuxê rûniştine, drya Salih destê xwe yê rastê li hustê wi gerandîye, Salih ji serê xwe daniye ser singa drya xwe, weha qederekê dîsekim. Dûre drya Salih Nalin serê lawê xwe radike lê dmere:

Nalin: - Weyla, ez bî qurbana te bîm lawo. Beri mîrînekê mîn ev roj ji dit. Îşê Xwedê çîqa xerib e. *(Hurdu destê xwe berbi ezmana vedike û dibê:)*

- Xwedêyo ez bî qurbana te bûmo, te ev roj ji kîre qîsmetê mîn êdi ez bîmrîn ji xem nine. *(Çend caran kurê xwe maçî dîke û dibê:)* Kurê mîn ka bûka mîn ya te ewqa behsa wê ji mîn re dîkîr?

Salih: - Dayê kareki wê hebû, nîha li ku-be ew ê wêre û bînêre bê kurê te çî bûk aniye.

Nalin: - De baş e, lawo baş e, xwedê we bî hev şerintîr bîke.

Salih: - Dayê nîha ez ji tere çayekê çêkim,

heta Maria ji were ez ê herîm ji me re pizza binim.

Nalin:- Kurê mîn, mîn çay famkîr lê ya dîn çî bû te got.

Salih:- Pizza, dayê pizza, ma tu nîzane pizza çî ye?

Nalin: - Ez bî qurban ma dîya te ji ku dîzane ew çî ye, mîrov dîxwe, vedîxwe, an ji li xwe dîke.

(Salih bî wê rewşa drya xwe hebeki dîmîzmîze.)

Salih: - Dayê pizza xwarîn e. Xwarîneke xweş e. Dema te xwar tê wê demê bîzaniibi bê pizza çî ye.

Salih: - De bêje dayê weki dîn li gund çî heye çî tuneye?

Nalin: - Kurê mîn ma gund mînd mane, li welatê me gund nemane.... *(Hin axaftma wê ne qedîya, deriyê odê vebû, Maria bejn zîrav bî kîncîm tenîk qut û xweşik, kete hundîr, li dû wê, kur û keçeka wê ketim hundîr, bî ketma wan î hundîr Salih bî awayeki ecele li drya xwe*

neri:)

Salih: - Aha dayê vaye bûka te ji hat.

(Rabû ser xwe çû pêşiya Maria, xêr-hatmek germ dayê:)

Salih: - Maria, ev diya min e.

(Maria qet mûrizê xwe yê tîrş xera nekîr, berbî drya Salih çû, destê xwe dirêji wê kîr, meta Nalin destê xwe yê rastê ji bo Maria maçi ke dirêj kîr, lê Maria tenê bî destê wê girt û berda, tu tîştêk ne got. Lî zarokan neri.)

Maria: - Werin divê hûn kincên xwe biguherin. *(Ew derbasi odaye dîm bûn. Diya Salih şaş mabû lî kurê xwe neri.)*

Nalin: - Lawo bûka te dîgot ev e?..

Salih: - Belê dayê, qe te ew ne eciband.

Nalin: - Gelo ew zarokên pê re yên kêne?

Salih: - Ew yên Maria ne.

Nalin: - Ev çawa dibê kurê min!? Ma hûn çî demê zewicin.

Salih: - Dayê xwe ewqa şaş meke, em şaş meh berê zewicine. Ev zarokan ji mêrê Maria yê beri min çêbûne.

Nalin: - Weyla lî min rebenê, icar ev çî ye lawo.

Salih: - Dayê tu gelekî şaş bû. Ma em lî Ewropa dijîn dayê, tîştên weha gelekî normal in. Dema jin û mêr lî hev bîkîn, tîştên weki din qet nakeve bira wan dayê. Niha ez û Maria hevdu berdîn, ew dikare here ji xwe re mêreki dîn û ez ji dikarim ji xwe re jîneke dîn binim.

Nalin: - Wey lî min por kurê. Wey lawo. İcar ev tîştên weha çî ne kuro lawo?!

(Meta Nalin serê xwe dîhejand dîbû niçe niça wê. Piştî qederekê Maria û herdu zarok hatin odê, her yek lî derekê rûniştin. Zaroka lî drya Salih dînerin, piştîre lî hev mêze dikirin û dîkeniyan. Salih derbasi mutfakê bû, piştî qederekê

lî ser tepsiyê du çay û qahweyek ani dirêji drya xwe kîr, drya wi weha bî awayeki matmayî çaya xwe girt, dîre Salih tepsî berbî Maria dirêj kîr, wê ji qahwe xwe girt, Salih tepsî dani ser masaya ortê û wi ji çaya xwe girt û ji drya xwe re:)

Salih: - De ka te qala xalê min Dawidê din nekîr, ma ew hin sax e.

(Meta Nalin bî mûrûzeki tîrş û zû bî zû:)

Nalin: - Belê, belê hin sax e. *(Gulpek lî çaya xwe xîst, lî kurê xwe neri) ev çay gelekî xweş e. Gelo ev çî çayê ye kurê min?.*

Salih: - Jê re çaya Ceylon dibêjin, dayê.

Nalin: - Erê lawo, berê dî rêya Suriyê de, qaçaxçiyên ev çaya dînin, hêla me. Ev çay gelekî xweş e. Lê niha lî ba me ev tu ne ye.

Salih: - Çima dayê?

Nalin: - Ji ber ku êdî qaçaxçî nîkarin herin û werin, loma em ji jî vê çaya xweş mehrûm mane.

(Piştî qedandina çay û qahwê, Salih qedeh û fincan bîrin hundîr mutfakê, hate hînda Maria xwe ya bejin zîraf.)

Salih: - Maria, em birçî ne, ez dîxwazim ji diya xwe re pizza binim. Tu çî dîfikire? Tu û zarokan ji hûn ê pizza bîxwin?

Maria: - Belê, gelekî baş e.

(Weha xuya bû ku dengê xwarina pizza çûbû zarokên Maria ji loma herduyan bî hev re bî yek dengi:)

Zarok: - Wey pizza!

(Rebena drya Salih şaş mabû, carna lî

bûka xwe ya ku lawê wê ewqa pesnê wê dîda dmeri, carna ji li wan zarokan. Nema zanibû wê çî bêje, kesere xwe bera ber dilê xwe dabû. Salih ji rabû ser xwe li dîya xwe neri.)

Salih: - Dayê vaye ez ê herim ji te û zarokan re pizza binim.

(Dîya wi tu tîstek negot, Salih derket çû, rebena dîya wi di nava wan da tenê ma, ne dîzanibû bixafîya, ne dîzanibû tîstek bigota.)

Lawikê Maria.

Bengt: - Dayê wê çî demê pizza werin? Ez geleki birçî bûme.

Maria: - Wê niha werin.
(Keçê ji ji diya xwe re:)

Eva: - Dayê ev ki ye li ser qoltixê rûniştîye?

Maria: - Salih got, ku ev diya wi ye.
(Meta Nalin hin bêtir şaş mabû, tenê ji xwe re li devê wan dneri.)

(Destê Salih de çend pakêtên pizza û di hundir torbeyeki de ji çend selate û hin ji cola-cola hebûn, ew dani ser masê, beri ku bani zarokan bike, wan hucûmi ser pizzeyan kir. Maria ji xwe nêziki masê kir, Salih çû mutfaxê kêr, çetel û qedeh anin ew ji dani ser masê. Ji nava wan pakêtan yek hîlbijart vekir û dirêji dîya xwe kir.)

Salih: - Dayê min ev xusûsi ji bona te da-ye çêkirinê.
(Pizza dani ber dîya xwe Meta Nalin weha li wan pizza neri, fitili ser kurê xwe.)

Nalin: - Te got ev çî ne?

Salih: - Pizza jê re dibêjin dayê, pizza, geleki xweş in.

(Meta Nalin bi desta hmek ji pizzayê xwe jêkir parreyek xiste devê xwe û ji kurê xwe re.)

Nalin: - Kurê min vana weke şamborekê me yên dev vekirine, hema tu ji diya xwe re ard, pivaz, goştê qime û çend serê bacanê sor bine ez dîkarim ji van xweştir ji were çêkim.

(Salih mîzmîzi.)

Salih: - Dayê vana ne şamborek in, navê wan pizza ne.

Nalin: - Belê ez bi qurban tîstê ku ez divê tu bine, diya te wê ji van xweştir ji vê xanîma te ya delali û zarokên wê re çêke.

(Salih li Mariya xwe neri.)

Salih: - Maria tu zani diya min çî dibêje?

Maria: - Na, ez nîzanîm çî dibêje.

Salih: - Ew dibêje ku ew dikare ji van baştir çêbîke.

Maria: - Geleki baş e.

(Bi vi awayî hemîya dest bi xwarma pizza kirin, hîma qedandibûn, hîma hin dixwarin, lê rebena meta Nalin ji xwarma wan zaroyan şaş mabû, te digot belki ew zaroyan ji ber xelê hatme. Xwarma pizza qedryabû, Salih pakêtên vala avit, çû mutxafê çay û qahwe da ser hat ba diya xwe.)

Salih: - Dayê rabe destên xwe bişo.

(Salih bi destê dîya xwe girt ew bir dest-şokê, dûre vegerryan, diya Salih rûnişt. Maria bani Salih kir.)

Maria: - Salih, divê ez herim, gelo qahwe hazir nebû?

Salih: - Piştî deqîqeyekê temam e.

(Salih rabû berbi mutfaxê de çû, diya li ser tepsîya wi du çay û fincanek qahwê hebû. Piştî vexwarina çayê û qahwê Maria û zarokan cilên xwe yên derve li xwe

kırm. Jı Salih û drya wi re gotm "Bı xatirê we" Derket û çûn.)

(Pışti derketma Maria û zarokan, meta Nalin hebeki rehet bûbû. Serê xwe berbi Salih de zivrand.)

Nalin: - Berxê min ma ev çî halê te ye ku tu tê de ye?

(Salih weha bı awayeki şaşo maşo lı drya xwe veğerand.)

Salih: - Çı bı halê min hatiye dayê, ma jı vi hali xweştir... Tu binêre hertiştên kurê te heye, trimpêl, pere, mal, jin û bı xêr wê niha torênın te jı çêbıbin. Ma jı vi hali xweştir wê çibe dayê.

Nalin: - Na, kurê min na, mebesta min ne ev e.

(Beri ku Salih qesta wê bıpırsê, telefon lê ket Salih rabû ser xwe, telefon girt.)

Salih: -Elo, fermo (sekını) wah Ali tu yi? (sekını) tu dı nava xêrê de bi. Bila tu sax bi. (sekını) Diya mın do hat. Niha em jı xwe re lı ba hev rûniştine û behsa welêt dıkın. (sekını) Bila ser sera û ser çavên mın werın. Sıbê saet şeşan de.

(Telefon dani hat ba drya xwe.)

Salih: - Dayê ew Aliyê usê bû, tu bavê wi baş nasdıki, ew jı jı gundê me ne. Ew û zarokên xwe wê sibê werın ditina te.

Nalin: - Bila werın kurê min. Ma ew jı bı bıyanıyan re zewıcıye.

Salih: - Na, dayê wi jı xwe re yek jı gunani, rebena jına wi gundi ye, tu tıştek famnake.

(Dı wê navberê de telefona wan disa lê ket. Salih rahışt telefonê.)

Salih: - Elo fermo. (sekını) wey bı selamet, Kadiro tu ye?. Kuro diya mın jı he-ma behsa te dıke. (sekını) Ey de bı xır

werın, bı Xwedê sibê wê Ali û zarokên xwe jı werın, hema hûn jı pışti saet şeşan werın, tamam.

(Salih telefon dani bı kêf hate ba drya xwe û jê re:)

Salih: - Dayê ew jı kurê Gero ye. Wan jı xwestın werın bıxêrhatinekê lı te bıkın.

Nalin: - Bila werın, gelo halê wi çawa ye. Ma ew jı jı bıyanıyan zewıcıye?

Salih: -Na, dayê wi jı jı xwe re qıza meta xwe aniye.

Nalin: - De baş e, lawo baş e. Xwedê me re jı merıvaniyê neke. Kurê mın, mın jı jı te re got, em ê jı te re qıza xalê te binın te got na.


Salih: - Na dayê, zewaca bı merıvan re û bı cahilan re zehmet e. Ma tu qusura lı bûka te heye? Bı Xwedê, bûka te dıkare deh jinên Kurd jı bêrikek xwe derxe.

Nalin: - Na kurê min, tu qusura wê tune ye, qusur qusura te ye. Hema roja ku ez hatime tu rewşa te û mala te neket serê mın. Junik her gav rûniştıye, tenê tu kar dıke, ma qey tu xızmetçiyê wê ye.

Salih: - Dayê te disa şaş famkıriye. Ne tu nızani, dema mêvanê wê jı bên, wê demê ez rûdnêm tenê Maria kar dıke. (xwe hebeki bı vê gotinê re dinepıxine.) Em lı Ewropa dıjin, tıştên weha geleki normal in.

Nalin: -Lawo wele, mın tu tışteki normal neditıye, lê bila weki te be. Qey ez şaş ım. *(Serê xwe dihejine û dıke nuçe nuç.)*

Perde tê girtın
Dumahik dı hejmara bê de.



Erebê belengaz û şewiti

William SAROYAN

Ji swêdi wergerand: Haluk Öztürk

Mam Xosrov, ku bi xwe mêreki qerese-yi bêteşe mezin bû, û keseki ecêb dilbîşewat bû, salekê bi mêreki tel-biçûk ra bûbû heval, ku ew ji ji welatê berê bû. Ev hevalê teze, keseki di hundirê xwe da wisa melûl û bêdeng bû, te dîgot qey kevîrek e. Wi xem û êşa dilê xwe hertim bi dawşandina toza ser çokên xwe û bi neqisekirinê dîandî der.

Ev mêrik bi xwe Ereb bû, navê wi Xelil bû. Bi gewdê xwe, ji lawikeki heşt sali mezintir xuya nedîkîr, lê simbêla wi wek ya mamê Xosrov mezin bû. Temenê wi bi texmini li dor şêst û çend sali bû. Dîgel vê simbêlê ji, ji mirov ra wisa hesil dibû ku ew di dilê xwe da ji zilameki bêtir zarokek bû. Çavên wi çavên zarokeki bûn, lê bi hesreta salan dagirtî bûn, çendi- çend sal bûn ku ji tiştên xwe yê hezkîrî, ji delaliyên xwe veqetîya bû, dibe ku hesreta welatê xwe dikişand, yan ji bira diya xwe, bavê xwe, birayê xwe, hespê xwe yan ji tişte-

ki dîn dîkîr. Porê wi nerm û gumreh bû, û heta bêji reş bû, û li aliyê çepê şekîrî bû, ey-ni wek yê wan lawikên biçûk ku wexta nû hatibûne Amerikayê, dê û bavên wan fêri wan kiribû ku bi çî teherî porê xwe şe bîkin.. Serê wi hetani nêzîki simbêlê wek yê şagîrteki dibistanê bû, gewdê wi ji wisa. Wi qet ingilîzi nedîzani, tenê hînek tîrkî, çend gotin kurdî û gelekî hindîk ermenîkî dîzani, lê wê çî bîkîra ji zanîne, çawa hebe qise nedîkîr.. Dema carekê qise bîkîra ji, bi dengekî wisa dipeyivî te dîgot qey ew deng ji wi bi xwe bêtir ji welatê berê derdîket. Wexta qise dîkîr, te dîgot qey lêborînê dixwaze çima ku mecbûrî qisekirinê bûye, minna ku bi qisekirinê tenê derd û keserên ku di dilê wi da hebûn her zêdetir dibûn, çî ji bigota cihê êş û azarê bû, lewma bêdengi dipejrand.

Mam Xosrov ê ku tu wextê ne mumkûn bû ku li ser her tiştêkî illa gotinekê nebêje, gelo çawa bi vi mirovî ra wisa ji nêzîk va

bûbû heval, ev tışteki seyr bû ku heta niha ji em sebebê wê nızanın. Mam Xosrov û ereb her hal cara pêşiyê li qehwexana Araks hevdu ditine û naskirine.

Mam Xosrov dost û dijminê xwe li gor şeweyê tavleleyistina wan hildibijart. Hemû leyistik ji bo diyarkirina xûyê tabii yên insanen bergên ceribandîne ne û Mam Xosrov bî xwe dema di leyistikê da bixesiriya gelekî zora wi diçû, lê, dema reqibê wi bixesiriya û nerazibûna xwe diyar bikira Mam Xosrov zehf aciz dibû.

- Yaho! Çi mize-mıza te te ye wisa? wi li yeki xesiri kir qêrin. Ma çî bû te wînda kir, leyistik e, qey dinya xirab nabe!

Dinya wi bî xwe xirab dibû, gava carekê leyistikek jê biçûya, lê bî ser asoya wi dîket dema yeki dîn bikaribûya sembolika leyistikê bî qasi wi ciddî bigirta. Ji bo kesên dîn leyistik leyistik bû, tışteki ne ewqas ciddî bû di çavê wi da. Lê ji bo wi bî xwe leyistik qeder bû - li ber maseki, li aliyê dîn ji keseki beredayî rûdinişt zar dihejandî, bî bî tırki tışt diğotin ji wan ra, lavayi wan dîkır, pîste-pîst dîkır, diqêriya û bî gelek awayên dîn xwe li ber wan biçûk dîxist.

Mam Xosrov bî xwe ji zaran dîtirsîya, wi ew wek dijminên xwe yên taybetî didîtî û tu wextê gotineke qenc li wan serf nedîkır, wi zar diğirtî dî pencerê ra diavêtî, yan ji ji seriki odê dipekande seriyê dîn û bî lez û bez sandoqa tavlê ji ser masê paqış dîkır.

- Segbav! diqêriya.

Û bî hêrs berê xwe dida reqibê xwe, di ser da diqêriya:

- Yaho! hemşeriyê mîn! Tu qet şerm naki? Çima ewqas xwe nızim dîxi li hember wan. Tu lava û tîka dîki ji wan, di şûna te

da ez şerm dîkim. Ez bî xwe tîfi wan dîkim.

Yên ku carekê bî Mam Xosrov ra tavle bileyistana êdî hew careke dîn pêra dileyistî.

Ev qehwexane di wextê xwe da ciheki gelekî naskirî bû û xelk pır dahitine wır. Hîna ji wisa ye, lê gelek ji wan kesên ku bîst sal berê dihatîni niha mirî ne.

Ev der ciyê ermeniya bû, lê kesên dîn ji dihatîni. Hemû kesên ku welatê berê dianîni bîra xwe dihatîni vır. Hemû kesên ku ji welatê berê hez dîkırîni. Hemû kesên ku berê tavle leyistibûn, iskambil leyistibûn li welatê berê. Hemû kesên ku ji xwarîni, şerav û reqiya welatê berê û qehwa wê ya ku di fincanên biçûk da danê esrê vedîxwarîni, hez dîkırîni. Hemû kesên ku ji stran û çirokan hez dîkırîni. Û hemû kesên ku dîxwastîni werîni ciheki wisa ku bîna welat jê bê, bî hezaran mil ji welat dûr.

Mam Xosrov her car piştî nivro di saet sîsiyan da dihatê qehwexanê. Weha carekê çavê xwe li lokalê diğerand dûra li koşeyeki bî tenê rûdinişt, û paşê bî hêrs û û mirûzeki tırş radibû û diçû, bêyi ku tu kesi jê ra tıştek gotibe.

- Feqîrên belengaz, her tîm wisa diğot. Mexlûqatên bêçare û belengaz. Yan ji weha diğot: Feqîrên belengaz û şewiti.

Belengaz û şewiti - ev gotîni nayê wergerandîni li zîmaneki dîn, lê di vê dînyayê da ji vê gotîne hezintîr û xembartîr gotîni tunene.

Her hal Mam Xosrov rojekê dema li koşeyê xwe rûniştîye çavê wi bî vi erebê biçûk ketiye, û yekser li cem xwe bîryar daye ku ev mêreki gelekî qenc e. Dibe ku ereb rûniştîye û tavle leyistiye, bî wê navmîla xwe ya fire enişkên xwe daniye ser masê û serê xwe spartiye qefa desteki xwe, serê

xwe yê reş, yê ku bî aql û bî derd û kulên dinyayê tiji bûye, û dibe ku gava wi leyistika xwe kutakiriyê û rabûye ser piyan, hingê Mam Xosrov ditiye ku bejna wi ji ya zarokeki ne dirêjtir e.

Yan ji dibe ku ereb rojekê hatiye qehwe-xanê û bêyi ku nas bike li ba Mam Xosrov rûniştîye û pê ra destek tavle leyistiye û xusîriye, lê qet berneketiye; û lavayi zaran nekiriye lewma sempatiya Mam Xosrov qezenc kiriye.

Axir sedemê pêkhatina dostaniya wan çî bûye, dî navbera wan da çî celeb hevfehmîkirin hebûye bila hebe, heqiqet ew e ku carna herdu tevayî dihatin mala me û herdem bî kêfxweşî dihatin ezimandin.

Demam Mam Xosrov cara pêşîn ereb bî xwe ra ani mala me, qet pêwîst nedit ku wi bî me bide naskirin. Diya mîn ji li cem xwe bawer kiribû ku ew hevvelatiyekî me ye, dibe ku xîsmekî me yê hîneki dûr e, her çend porê wi ji porê pîraniya me reştir, û bejna wi ji kurtir bû. Belê ji xwe tu maneyeke van tiştan ji tunebû, pîrrengiyeke weha tenê çîhê şanazîyê ye ji bo xelkeki. Ev xusûsiyet tenê şêleke mîrovi dide civatekê, jîyanê jîyanbartir û xweştir dîke.

Ew roja pêşîn bû ku ereb hate mala me, piştî ku rûnişt diya mîn dest bî xêrhatina wi kir, belkî niv dizûne car jê ra got ku rehet rûnê wek ku li mala xwe ye.

Gelo guhên wi kerr in? wê li cem xwe meraq kir.

Na, xuya bû ku baş dibîhist, ji ber ku bî baldari guhdari dikir.

Dibe ku ji zaravayê me fehm nake. Diya mîn jê pîrs kir ka ji kijan bajari ye. Wi tu bersiv neda diya mîn, tenê piçeki toza ser milê qapûtê xwe dawşand û hew. Paşê diya mîn bî tîrki jê pîrsî: Tu ermeni yî? Wi fehm kir; bî tîrki got ku ereb e.

-Belengazê şewîti, Mam Xosrov bî nermîkayî got.

Pêşiyê diya mîn welê bawer kir ku ereb wê qise bike, lê dûra zû serwest bû ku -eyni wek Mam Xosrov- bona vi mirovi ji bî qasî qisekirinê tiştêkî nexweş û xirab tune ye li vê dinyayê. Wi dikaribû qise bike, eger hewce bîkîra, lê bî rasti tiştêkî wi yê gotinê tunebû.

Diya mîn titûn û qehwe dani ber herduyan û bî destê xwe rîya derî nişani mîn da ku ez ji odê derkevim.

- Ew dixwazîn bî tenê bîn, ji xwe ra qise bîkîn.

- Qise bîkîn? mîn got.

- Ew dixwazîn bî tenê bîn, wê got.

Ez çûm li ber masa oda xwarinê rûniştim û mîn dest pê kir rûpelên jimareke sala çûyî ya *Saturday Evening Post* welgerand, ya ku mîn hemû tiştên tê da ezber kiribûn- xasma wêneyên wê: wêneyên mîmariyên şahane; otomobil û kesên sosyetê; maseyên raxistî û li ser wan tasên şorbêyên ku jê hulm-gulm radibûn; mîrên ciwan ku bî taximên kîncan gelekî elegan xuya dikirin û gelek wêneyên din.

Herhal mîn bê hemdê xwe rûpelên wê bî hişki welgerandine û deng derxistiye ku:

- Huş be, kuro, huşş..! Mam Xosrov bangî mîn kir. Mîn ji hema dî wê navê da awîrek avête hundirê oda rûniştinê û dit ku ereb hîneki toza ser çoka xwe dawdîşîne.

Ew saetekê dî hundir da rûniştin û paşê ereb rabû ser xwe, bihneke kûr kîşande cigêrên xwe û bêyi ku tu tiştêkî bêje, kete ser rîya xwe û çû.

Ez çûm oda rûniştinê û li şûna ereb rûniştim.

- Navê wi çî ye? mîn got.

- Huş be, Mam Xosrov got.

- Erê, lê navê wi çi ye?

Mam Xosrov wisa acız bû, nızanibû çi bike. Wisa bî dengeki bilind lî diya min kîr qêrîn, te digot qey hîn kes dîkîn wi bikujîn.

- Mariam! Mariam!

Diya min bî lez hat.

- Çi ye? wê got.

- Ka evî jî vir derxe, Mam Xosrov got.

- Çîma, çi bûye?

- Dîxwaze bîzanibe navê ereb çi ye.

- Êê, îcar? diya min got. Çî dibe, tu jî jê ra bibêje. Ew zarokek e, meraq dîke, tu jî jê ra bibêje.

- Wa! tu jî! axineke kûr kîşand Mam Xosrov. Erê tu jî. Xûşka min jî. Xûşka min, belangaza şewîti.

- Êê, navê wi çi ye? diya min pîrsî.

- Ez nabêjim, Mam Xosrov got, ez hema qet nabêjim, ewqas, nabêjim.

Rabû û çû.

- Ew nîzane navê wi çi ye, diya min jî min ra zelal kîr, tu jî nekeve rîkê wi, bî serda meçe, wi acız meke.

Sê roj paşê, dema Mam Xosrov û ereb disa hatin mala me, ez lî oda rûniştinê bûm, Mam Xosrov rast hate ba min û jî min ra got:

-Navê wi Xelîl e, hadê here îşê xwe.

Ez çûm lî hewşa pêş xanî sekinim da ku jî kurapên min yek were derva em bileyîzîn. Lê pîştî deh deqîqan min dit kes nayê, ez rabûm çûm mala kurapê xwe Mûrad û lî wir bî qasî saetekê me wextê xwe bî nîqaşan derbas kîr: ka pîştî pênc salan kî jî me wê bî hêztir bibe. Me sê caran gulaş girt, her sê caran jî wi zora min bir, lê carekê hindîk mabû ez wi lî erdê xim.

Dema ez vegeyriyam malê ew çûbûn. Min bazda ez rast çûme oda rûniştinê, lî wir nebûn. Tenê bîna wan û bîna dûyê tî-

tûnê mabû.

-Wan qe çi qîsekîrîn? min jî diya xwe pîrs kîr.

-Min guhdarî nekîr, wê got.

-Ma qet nepeyîvîn?

-Ez nîzanîm.

-Na, ew napeyîvîn, min got.

Hinek mîrov dîpeyîvîn, gava tîşteki wan ê gotinê hebe, diya min got, û hinek jî qet napeyîvîn.

- Mîrov çawa dîkare bîpeyîve, bêyî ku yek gotinekê bibêje? min got.

- Mîrov dîkare bê peyv jî qîse bike, em her dem bê peyv qîse dîkîn.

- Wê çaxê peyv jî bo çi ne? feyda wan çi ye?

- Feyda wan ewqas tune. Ew bêtir jî bo ku mîrov rastiyên xwe pê veşêre tîn xebî-tandin, tîştên ku dî dilê mîrov da hene û mîrov naxwaze bîde xuyakîrîn.

- Qey tu dibêjî ew herdu dîpeyîvîn bî hev ra? min got.

- Erê ez wisa texmîn dîkîm, diya min got. Ew tîn rûdinên, gulma lî qehwa xwe dîxîn û cîgarê dîkîşîn. Ew tu wextê devê xwe venakîn lê herdem qîse dîkîn. Ew jî hevdu fehm dîkîn û hewce nabinîn ku devê xwe vekîn. Tu tîşteki wan nîne ku jî hevdu veşêrîn.

-Îcar ew bî rasti dîzanîn ku ew lî ser çi dîpeyîvîn?

-Belê, bêguman, diya min got.

-Çî qîse dîkîn, jî min ra bêje?

-Ez nîkarîm bêjim, jî ber ku danûstandîna wan ne bî gotinan e. Lê ew dîzanîn çi ye.

Tam salekê Mam Xosrov û ereb wisa jî xwe ra car-caran dîhatîn mala me, saetekê carna du saetan rûdîniştî.

Carekê Mam Xosrov jî nişkêva kîr qêrîn. Tîşteki ez bibêjim tune - ma tu serwaxt

nabi, hal ew bû ku ereb ji tu tîstek negotîbû.

Lê pîri caran bêyi ku yek gotinekê ji hev ra bêjin, wextê xwe diborandin paşê radi-bûn û diçûn. Kengê rabûna, Mam Xosrov hêdika diçûn: Feqîrên belengaz û şewiti! û yê Ereber hinek toza çoka xwe dawdîşand.

Rojekê dema Mam Xosrov bi tenê hate mala me, wisa li ba min meraq çêbû, gelo ev çend meh e, ereb çima êdi nayê mala me.

- Ereber kanê? min got.

- Kijan ereber? Mam Xosrov got.

- Ew erebê biçûk ê belengaz û şewiti, ku carna bi te ra dihat, min got. Ew li kêderê ye?

- Mariam! Mam Xosrov kir qêrin. Li wir sekîni bû te diçûn qey serçavê wi ji qehra reş bûye.

O, o! min di dilê xwe da got. Ev çî ye, ma min çî got? Min çî şaşî kir?

- Mariam! wi kir qêrin: Mariam!

Diya min hat.

- Çî ye? wê got.

- Ji kerema xwe ra, Mam Xosrov got. Ev kurê te ye. Tu xûşka min a biçûk i. Ka evi derxe derva. Ez gelekî jê hez dikim. Ew amerîkan e. Li wir çêbûye. Rojek wê bê ew ê bibe miroveki mezin. Qet şika min tune. Ka ji kerema xwe ra wi derxe derva.

- Çima? Çî qewimî? diya min got.

- Çima? Çima? Qise dike. Tîştan pîrs dike. Ez jê hez dikim.

- Aram, diya min got.

Ez li wir sekînbûm, madem Mam Xosrov ewqas li min hêrs dibû ez ji bêtir. Li wi hêrs dibûm.

- Kanê ereber? min got.

- Mam Xosrov berê xwe da diya min û ez bi dest nişan kirim-bi hêrs û lerz. Aha tu dibîhîsi, bi jêstên xwe got. Kurê te. Xwar-

ziyê min. Kurê xûşka min. Ji goşt û xûna min. Tu fehm dikî? Em hemû feqîrên belengaz û şewiti ne. Hemû, xênci wi, tenê ew ne wek me ye.

- Aram, diya min got.

- Ez fehm nakim, qesta Mam Xosrov çî ye, dema ku qet tîşteki nabêje, min got. Kanê ereber?

Mam Xosrov bê gotin û bê deng ode terk kir û çû.

- Ereber miriye, diya min got.

- Wi kengê ji te ra behs kir? min got.

- Wi behs nekîr.

- Lê tu çawa dizani?

- Ez nizanîm, diya min got. Lê miriye.

- Mam Xosrov bi rojan nehate mala me.


Min bawer dikîr ku êdi wê tu wextê paşda neyê. Dawiyê da, dema hat, li oda rûniştinê li ser piyan sekînbû, şewqê wi di dest da û got:

- Ereber miriye. Bi tenê, bê xwedî li welatê xeribiyê, hezar mil ji mala xwe dûr. Ew li wê hêviyê bû ku vegere welatê xwe û li wir bîmre. Wi zehf dixwast ku beri mirinê la-wên xwe bibîne. Wi zehf hêvi dikîr ku bi wan ra xeberde beri ku bîmre. Wi zehf dixwast ku carekê wan disa bin bike. Qet perê wi tunebû. Tim difikîri ji bo pera. Anîha êdi miriye. Hadê here îşê xwe. Ez ji te hez dikim.

Gelek tîşt hebûn ku min dixwast ez jê pîrs bikim, xasma derheqa kurên ereber da, gelo çend kes bûn, çiqas wext û zeman bû ku ji wan dûr ketibû û hwd. lê min biryar da ku ez herim mala pîsmamê xwe Mûrad û biceribînim ka niha pê dikarim yan na, û ez derketim çûm bêyi ku yek gotinekê bi-bêjim- bêguman ev tewrê min gelekî bi dilê Mam Xosrov bûye, dibe ku jê ra bawerî çê bû ku disa ji ji bo min hêvi heye.

HEVPEYVÎNEK DI GEL SIDQÎ HIRORÎ

• HEVPEYVÎN: Bûbê Eser •



Romana te "Kurê Zinarê serbilind"
Rîlî Stokholmê dî 1996-a de derket,
mesaja te dî wê romanê de bo xwende-
vanan çî ye?

Dî romanekê de gelek mesaj dîkarin hebîn, her eynî tiştî dî ya min de jî heye. Lê bê guman mesaja sereki dî "Kurê Zinarê serbilind" de balkişandî e bo ser rewşa me ya navxweyi ya çirrhayi û dirrhayi û aya em dîkarin bî vi serûberê neyekgirtî tiştêki jî mirovê xwe re bîkîn? Erê gelo bî vê siyaseta dagirkeran ya nepejirandîna hebûna kurdan û mafên wan yê netewî lî ser axa wan dê kurd bihên bînbîrkîrî? Roman bî xwe berçavkirîneka serpilki ye bo rewşa başûrê Kurdistanê piştî serhildana 1961ê û heta Enfala 1988ê.

Hin dibêjin ku romana te jî romanê bêtir, biranin in û ew jiyannameya te bî xwe ye?

Hilbijartîna şeweyê nivisandîna romanê girêdayî niviskari û hezkirîna wi û desthiliya wi ye dî şeweyeki jî şeweyên

nivisandîna romanê de û peywendîdar e bî hindê jî ka endêşeya wi çî formê dîde babetê dî serê wi de bona ku dî darîştîna wê de serbîkeve. Roman dîkarin bî şeweyê biranînan bî û dîkarin jî reportajik û yan jî her şeweyekê dînan bî. Niviskar dîkare bî xwe qala serhati û bûyerên ku bî serê wi hatîne bîke û herweha kesê sêyemî dîkare bîbe goto û çirokê jî mere bibêje. Şeweyê biranînan romanê jî romanbûna wê naxe lê ya giring ew e ka niviskar dî wi şewazi de çend serkeftî û sernekeftî ye û lî ser vê pîrsê jî rexnegir dîkarin rabîwestî.

Dî her romanekê de eger nehemi beşeka niviskari jî tê de heye. Kurê Zinarê serbilind pêkhatiye jî gelek çirok û serhatiyên gelek kesan ku dî yek kesî de -dî Şêroyî de- civiyane serhev û beşeka min jî tê de ye.

Mîrov dî vê romanê de pêrgî gelek çirokan dibe, mîna serhatiya Besnayê, Şêroyî û gelekên din, gelo mîrov dîkare bibêje ku ev roman jî çend novelan pêkhatiye?

Dı her romanekê de çend novelek hene, evca çı ew dı yekcarê de, pevra, bı hızra romanê û dı dema nıvisandına wê de hatine afrandın û çı ji lı destpêkê weki novelên serbıxwe hatıbın nıvisandın û paşi ew dı mejiyê nıvisandın de gıhabıne hevûdu û dı encamê de bûne yek roman, ya gırıng ew e ku weki roman, destpêk û grêk û dawı pêkve grêdayı ne û çirokên wê yên cor bı cor hevûdu tımam û têr dıkın û hemûyeka ava pêşkêşı xwendevanı dıkın. Mın Kurê Zınarê serbılınd lı destpêkê weki du novelan lı dawıya 1988ê nıvisandın. Lê mın lı sala 1990ê hewılde wan bı kım roman û lı sala 1991ê nıvisandına wê bı dûmahık hat.

Tê gotın ku romana te bêtır bı devoka te ye?

Kesê ku bı devoka mın ji dixavın dıbêjın ka çıma mın ew bı devoka xwe nenıvisand. Ez bı awayekê vekırı dıbêjım ku dı vê romana mın de gelek devokên kurmanciyê, çı ji aliyê rastnıvisê ve û çı ji aliyê rêzımanı ve dıhên ber çavan. Mın ew beri mıjûlbûna xwe bı pırsgrêkên zımanı ve nıvisand û ew roman ji mın re pêngavek bû ber bı rawestıyana mın lı ser hınek pırsgrêkên dı kurdiya kurmanciyê de.

Tu dı romana xwe de bêtır lı ser rewşa başûrê Kurdistanê radiwesti, erê gelo ku mêrxasê romanê.Şêro berdewam be lı ser çiroka xwe, ew dê çı cudahiyeke dı navbera qonaxa beri 1988ê û pişti wê bibine?

Ew bêguman dıkare bıbe babetê romane-ka dın ya tımamker bo vê. Lê xuyaye ku rewşa nuke ya navxweyi ya kurdi ji ya wê dema ku roman lı ser radiweste, bı awayekê gıştı xerabtır e. Evca ku Şêro pişti vegeıra xwe nebûye deholqutê çı

partıyan û sıyasetên wan yên şaş û berjewendiyên gıştı yên gel û welatı lı ber çavên wı bın dê bêguman vı serûberê nıha lı başûrê welatı û jêkvebûna hêzên kurdi yên mezın û sereki bı karekê xerab û ji kurdan re bı ziyangehin lı qelem bıde.

Romana bı kurmanciyê lı başûrê Kurdistanê dı çı rewşekê de ye?

Hındı mın hay jê heye romana bı kurmanciyê lı başûrı bı romaneka wergerandı destpêkırıye. Salıh Se'ıdullayı romana Diploması -The Diplomat- ya James Aldridge ji İngılızı lı ser erêkırına nıvisandın bı xwe dı nameyekê de bo wergervanı kır kurmancı û lı sala 1984ê lı Bexdayê bı tipên erebi ji çapê derkeft û hat weşandın.

Lê weki roman ku bı kurdiya kurmanciyê hatine nıvisandın, du hewıldan bo cara yekem dı kovara "Peyv" ya "Êketiya Nıviskarên Kurd -Tayê Duhokê", hejmarı duyê ya sala 1994ê de bı ber çavên mın keftın. Ew ji pişka yekê ya kurte romana Hesên Silêvaneyı "Gulistan û şev" û pişka yekê ji çiroka dirêj ya "Deng û basêd kurêd Pırefatê û çarenûsa wan" e ya Enwer Mehemed Tahırı. Mın paşi dı rojnameya Peyman ya 23.10.1996ê de ku lı Duhokê bı kurdiya kurmanciyê derdıkeve nûçeyek dit dıbêje ku kurte romana Hesên Silêvaneyı "Gulistan û şev" dı 94 rûpelên qebare navıncı de ji çapxaneyı Duhokê bı tipên latını derkeftıye. Û ya mın ji "Kurê Zınarê Serbılınd" lı 03.1996ê ji aliyê Nûdemê ve hat weşandın.

Pırraniya nıviskarên kurmancıxêv lı başûrê welatı bı tipên erebi dınavısın, gelo çıma te romana xwe bı tipên latını nıvisand?

Hilbijartina mın bo latiniyê ne ji wê ditinê dihêt ya ku dibêje ku tipên latiniyê bo nivisandina kurdiyê çêtir in, nexêr, ji ber ku bî ditina mın her zımanek lı gor wan tipên ku pê dihêt nivisandin dikare xwe pêşbixe; hem tipan lı gor xwe biguherine û hem ji xwe lı gor tipan biguherine. Ev pırseka biserdezalbûn û bıkarandinê ye.

Binasê hilbijartina mın bo tipên latiniyek e û ew ji ew e ku pırraniya kurmanciaxêvan; lı bakûr û başûrê biçûk gişt, lı başûr û rojhilatê ji beşek û lı dewletên Sovyeta berê ji careka dın bî tipên latini dixwinin û dınavisin. Em ji divê lı tıştên hevbeş bigerhın bona ku kurmanci ji ber bî standardbûnê biçe. Yek jı wan tıştên hevbeş ji tipên nivisandinê ne. Kurmanciaxêvên başûr jı ber naskırına wan bo tipên ingiliziyê dıkarın hêsantır hini tipên latiniyê bıbın jı hinbûna kurmanciaxêvên bakûr bo tipên erebiyê. Rasti jı ew e ku paşeroja nivisandina kurmanciyê lı bakûr û başûrê biçûk dê her bî tipên latini be û dê pêşbıkeve. Behdini jı devokeka kurmanciyê ye û çêtir e ku ew jı bî latiniyê bihêt nivisandin. Bêguman ev ne karekê hêsan e û zehmeti û asteng dê hebin, lê divê çend kesek destpê bikin û ez dibinim ku gelek kesan dest pêkiriye, çı lı başûrê welati û çı jı wan, yên ku jı başûri hatine derveyi welati, bî tipên latini dınavisin.

Her weki ez dızanim, dı hın kovarên kurdi de nivisên te dı warê zımani de ji hene, gelo tu xwe dı wi wari de çawa dibini?

Ez dı warê zımani de ne ekademik im. Ez dı xebata xwe ya niviskariyê de pêrgi çend problemekên rêzıman û rênivisê bûme. Ez jı ku lı ser wan pırsan dınavisim, dixwazim ku ew bıkevın ber destên kesên nebes kurdizan, lê herweha zımanzan

ji û ew bı lêkolin û gêngaşeyên xwe yên zanısti lı ser wan arêşeyan rabıwestın, jı bona ku bihên çareserkırın. Ez heznakım ku pırsgirêk bıminın nelıvandi û bê çareserkırın.

Niviskarên, em bıbêjin weki minak yên ereb, farıs, ingiliz û her weki dın, zımanekê nivisinê yê durıst heye; pırsên rêzıman û rênivisê dı zımanên wan de yan çareserkırine yan jı dezgehên taybeti yên resmi yên pıspor bı wan pırsan ve mijûl dibın. Pırsa niviskarê kurd û bı taybeti yê kurmancinivis newehaye; problemên wan yên zımani yên neçareserkiri bêhejmar in û ev jı barê niviskari grantır lê dıkın û karê niviskariya wi zehmettır û aloztır lê dıkın. Ew carna neçar dıbe ku berê xwe jı wi babetê ku ew tê de şehreza ye bıde bo ser zımani û wan gırıftarên zımanvaniyê yên ku dıkevın dı rêya wi de. Egera nivisandina mın jı lı ser hınek pırsên zımani her ev e.

Destpêka te ya niviskariyê çawa bû?

Mın jı weki pırraniya niviskarên kurd û bıkartêkırına zımanên desthilatdaran dest bı nivisandina kurteçirok û helbestan bı erebiyê kır, lê mın çı jı wan newesandin. Kartêkırına torê devki yê kurdi û paşi yê niviski û rewşa kurdi ya wê demê ya sıyasi ez lı destpêka salên heftêyan kêşam bo nivisina bı kurdiya kurmanciyê.

Bırayê mın Fewzi Hırori her jı destpêkê û heta derkeftına romana "Kurê Zınarê serbılnd" û heta vê gavê jı dı xebata mın ya niviskariyê de piştewan û arıkarê mın yên rûhi yê heri pêşveber bû. Her bı rêya wi herdu kurte çirokên mın yên pêşiyê; "Xwekuştın" û "Hızırkırınêk" gehıştın destê Mueyed Teyıbi ku lı wê demê dı rojnameya Hawkari de kar dıkır û lı sala 1977ê her dı wê rojnameyê de hatın wesandin. Tu dızani jı çapkırına berhema

yekê dî xebata niviskariyê de gaveka çend girîng e.

Mîn bî naznavê Rasti Hîrorî ev berhem

● weşandine:

Dimenek jî çiroka jiyana mîn, çirok, 1985, bî tipên erebî.

● Momkeka nevemûrî, kurteçirok, 1986, bî tipên erebî.

● Çend hozanekên nenavkîrî, helbest, 1986, bî tipên erebî.

● Qereç û dilber, helbest, 1989, bî tipên latîni.

● Rewşnebirê Kurd, kovar, hejmar 1, 1990, Polonya.

Kurd hene berhemên xwe yên niviski bî zimanên biyaniyan diweşînin, gelo mirov dikare wan weki niviskarên kurd binav bike?

Bêguman her berhemek li gor wi zimanê ku pê dihêt nivisandin dikeve pirtûkxane û diroka literatûrê. Lê bî ya mîn ku mirov pîrsa naverokê û formê û pevrevê girêdana wan ya dinamik deyne ber çavên xwe, mirov wê çaxê neçar e wê rastiyê bipejirine ku herdu tîşt; element û struktur, pevrevê, pênasnameya romanê çêdikin. Evca ku mirov li ser romanekê ku kurdeki bo nîmûne bî tîrki nivisandî rabîweste û bîbine ku dî naverokê de kesê kurd, welatê wi, hest û nest û hezkîrî û derd û problemên wi dihên berçavkirin, bî ya mîn, wê çaxê mirov dikare qala romaneka tîrki-kurdi bike. Weki minak, ku mirov temaşayî romana emriki bike, dê romana emriki-cuhi û romana emriki-efriqi û hwd. bîbine. Çêtirî nîmûne jî li ser vê çendê berhemên wergîrê xelata Nobelê li sala 1978ê Issac

Bashevîs Sîngîrî ne. Ku em wan bixwinin em dê bîbinin ku ev niviskarê bî koka xwe cuhiyê polonî bû, diçe Emrikayê û li wê derê hîni îngiliziyê dibe û romanên xwe bî îngilizî dînivise, lê bî naverokeka cuhiyane. Ew dî wan de qala mirovê cuhi, xelkê cuhi, jîyan û komel û xweşî û nexweşiyên wan dike û wêneyekê cuhiyê Ewruppayê Rojhîlat bereçav dike. Her eynî pîrsê jî niviskarê kurd jî yê ku bî zimanê dînan dînivise digire.

Berhemên te yên pêşerojê çi ne?

Li ser pêşerojê, mîn dî hejmara 44-45ê ya Roja Nû de nivisandiyê û berê digotîne paşeroj û xweştir e ku weki xwe bîmine jî. Û xerab nîne ku em deman, weha dabêş bîkin: Borîroj, nîharoj, paşeroj. Ez vebîgerim bo ser pîrsa te û berhemên paşerojê: romanek amade ye û yek jî hêj li bînan qelema ye. Pirtûkeka novelan û yeka helbestan jî durîst in. Proje jî hem li berdest û hem dî serî de jî hene.

Berî ku em axiftina xwe bî dawî binin, jî kerema xwe, xwe hîneki bî xwendevanên Roja Nû re bide nasî?

Navê mîn yê durîst Sîdîqî Abdulkadîr Abdulkrehman e. Û naznavê mîn Rasti Hîrorî bû. Ez li gundê Hîrorê, li başûrê welatî, li sala 1956ê jî dayîk bûme. Mîn xwendîna xwe ya destpêkê û navîncî û amadeyî li bajarê Mûsilê bî dûmahî anîne. Ez li sala 1984ê û 1985ê endamê redaksiyona Radyoya Dengê Kurdîstana Îraqê bûm. Ez li sala 1986ê jî bo xwendîne hatim Polonyayê. Mîn li sala 1992ê xwendîna xwe ya pêncsalî ya rojnamevanîyê li Universîteya Varşavayê bî nivisandîna tîza magîsternamêyê tîmam kir. Ez nîha jî li Stokholmê dimînim.

NAMEYA VEKIRÎ

Uppsala 21/03/1997

Jî hemî vêkxistênên Kurd
ên siyasi, çandeyî û komelî ra
nameya vekirî

Serok û kargêr û endamên berrêz,

Wek ku tê zanin, sala 1998-an, 100 saliya rojnama Kurdi ya pêşin "KURDISTAN" e. Rewşenbirê Kurd ê nemir Miqdad Midhet Bedîrxan, di tarîxa 22-yê Nisana 1898-an da li Mîsrê dest bi weşandina wê rojnama diroki kirîye, paşê birayê wî Evdîrehman Bedîrxan kargêriya rojnamê girtiye destê xwe û weşandina wê li Ewropayê domandiye. Her weha, sala 1998-an di 90salîya "NÛÇENAMA HEVKARÎ Û PÊŞKETI-NA KURDAN" (KÛRD TEAVÛN VE TERAKKÎ GAZETESÎ), ku di sala 1908-an da li Stanbolê bi Kurdi-Tirki derketiye.

Jî bil van her duyan, kovara "JIN" a çandeyî jî di sala 1998-an 80 salên xwe dadigire. Ev kovara giranbûha jî di sala 1918-an da sê salveger digirin hev.

Wek ku tê zanin, ez çend sal berê li ser "KURDISTAN"ê û "JIN"ê xebitibûm, min her du jî wergerandibûn tipên Latîni û jî nû ve çap kiribûn. Ez dixwazim bi kêfxweşî bîdîm zanin ku, ez nuha jî li ser "KÛRD TEAVÛN VE TERAKKÎ GAZETESÎ" dixebitim û wê jî werdigerinim tipên Latîni. Daxwaza min ew e ku ez beri Newroza 1998-an wê jî çap bikim û bigihînim destê xwendevanê Kurd. Bî vi awayî, di wê sala diroki da, her sê kovarên me yê diroki jî dê di destê xwendevanê Kurd da bin.

100 saliya rojnamevaniya Kurd jîbo me Kurdan bûyereka gelek girîng e. Di dirokên hemî neteweyan da bûyerên weha cîyên girîng digirin, bî û şênayî û civinan tîpîrozkirin. Biranin û pîrozkirina salvegerên weha tîgîhiştina neteweyî fire dîke, giyanê neteweyî xurt dîke û hevîrtîna neteweyî zexm dîke. Eşkere ye ku ihtiyaca me Kurdan jî hemî neteweyên di zêdetir bi biranin û pîrozkirina salvegerên weha heye.

Jî ber vê yekê, min, wek nivîskarekî Kurd ê ku li ser van her sê kovaran xebitiye û nuha jî dixebite, xwest ku ez bi vê nama vekirî 100 saliya rojnamevaniya Kurd, vebûyera netewî ya girîng binim bira gelê Kurd, xasma jî bira vêkxistinên Kurd. . Jî ber ku imkanên min tunin ku ez xwe bigihînim vêkxistinên Kurd û vê pêşniyaza xwe yekser bi wan bîdîm zanin, ez vê nama xwe ya vekirî jî rojname ê kovarên Kurdan ra dîşînim û bi riya wan bi hemî vêkxistinên Kurd radigihînim.

Ez jî hemî vêkxistinên Kurd tîka dikim ku:


1- Sala 1998-an bi navê "Sala Rojnamevaniya Kurd" qebûl bikin û ragihînin.

2- Biryar bîdîm ku 100 saliya rojnamevaniya Kurd di sala 1998-an da li Kurdistanê û li derê welêt bi konferansan, bi semîneran, bi civinên çandeyî, bi şênayiyên folklorî û wd. bê biranin û bê pîrozkirin.

Dî gel sipasan, silavan û daxwazên serketinê

M. Emin Bozarlan.

JI NAV WEŞANÊN NÛ



**CEMALI
ŞAHİNŞAHIYA
GOGA
LINGAN**
Weşanên Deng, Îstebol
1997


Nivîsarên ku di vê pirtûkê da ci digrin pêkeni ne ang "mizah" in. Cemali bi riya pêkeniyan gelek pirsên civaki û siyasî rexne dîke, xwendevanan him dîde fîkrandî him jî kenandî. Çawa ku nivîskar jî di pêşgotîna pirtûkê da dinivîse; kurd jî bo eşkerîkirina bir û baweriyên xwe mesele û qiseyan, çirokan, hikayetên biçûk gelek bi kar tinin. Di van qise û çirokan da henek bi

xurti ci digre. Bi kurti meriv dikare bêje ku, di warê "pêkeni" da edebiyata kurdi ya devki gelek dewlemend e. Lê di edebiyata nivîskî da, di warê pêkeni da gelek hindik berhem hene, hema bêje em li destpêkê ne. "Şahînşahiya goga lîngan" di vî wari da valahiyeke girîng tîji dîke.

Xwendîna pirtûkê gelekî hêsan û xweş e. Di pirtûkê da di gel kurdiya nivîsaran tirkîya wan jî heye. Lewma ev pirtûk jî bo kesên kurd yê tirkîaxêv, yê ku kurdi baş nizanin dikare bibe materyalekî fêrbûna kurdi. Ji ber ku ew mecala rûberhevkirîna nivîsarên bi herdu zmanan dîde xwendevanan. Pirtûk 300 rûpel e.

**AHMEDÊ MIRAZI
BÎRANÎNÊD MIN**
Weşanên Deng, Îstebol
1997

Çawa jî navê pirtûkê jî xuya ye, ew jî biranînan pêktê. Nivîskarê wê Ehemedê Mirazî bi eslê xwe jî Kurdîstana Bakûr, jî aliyê Serhedê ye. Piştî Şerê Cihanê yê Yekemî, Ahmed



ji wekî bi dehhezaran kurd, jî ber zulma Romê direve û diçe Êrîsetê. Ew serhatiyên xwe, jî zarotiya xwe heta jiyana xwe ya rewşenbiriye li Gurcîstanê derbasi ser kaxez dîke. Pirtûk bi destê Vazgal Bazîdî jî tipên kirilî hatîye wergerandin ser tipên latîni. Pirtûk 142 rûpel e.

**AHMED CENGİZ
ÇAMLİBEL
İDYOMÊN KURDÎ**
Weşanên Deng, Îstebol
1997

A. C. Çamlîbel di warê berhevkirîna zargotîna kurdi da xebateke nû pêkaniye. Berhemên di vî wari da gelekî kê m, het-



ta mirov dikare bêje ye-kemin car e berhemeke idyoman bî kurmanci-latini bî awayeki weha fireh û dî forma pirtûkê da derdike-ve.

Dî wê da jî bo her idyomeki nîmûneyek bîkaraniyê heye, da ku xwendevan bîzanibe dî kijan rewş yan jî pevgirêdanê da ew idyom tê xebitandin. Helbet edebiyata kurdi ya nîviski dî vi wari da jî lî paş maye, xebatên weha jî bo dewlemendkirina zîmanê nîviski, herweha jî bo pêşilêgirtina wîndabûna hin xusîsiyetên zîmanê me jî pêwîstî in.

**MUSTAFA
AYDOĞAN
PÊLÊN
BÊRIKIRINÊ**

Weşanên Nûdem, Stockholm, 1997

Jiyana surgûnê edebiyata xwe jî diafrîne. Pirtûka Aydoğan nîmûneyek e nû ye dî edebiyata me ya




mîhaciriyê da. Pêlên Bêrikirinê û berhemen wek wê dî demên pêşda wê bî-bîn belgeyên jiyana diaspora kurd lî welatên Ewropayê. Pirtûk 170 rûpel e.

AHMET ARAS

Şairê Kurda yê Evsanevi
EVDALÊ ZEYNIKÊ
Weşanên Deng, Îstenbol 1997


Nîviskar, lêkoliner û berhevkarê zargotina kurdi Amet Aras bî vê xebata lê-



kolini ya lî ser jiyana û berhemen Şair û dengbêjê bî nav û deng Evdalê Zeynikê, kareki geleki hêja kiriyê. Aras lî kesên emir mezin geriyaye, ditiye û pîrsa şair û dengbêjê mezin jê kiriyê, nîvisiyê û jî wîndabûnê xelas kiriyê. Bî kurti xebateke giranbuha ye, destê te sax be Ahmet Aras!




**NAVENDA
LÊKOLINÊN
KURDÎ**

Almanaxa Kurdi 1
Weşanên ROJA NÛ



Stockholm, Gulan 1997
Ev cara yekemin e ku dî nav Weşanên Roja Nû da almanaxek tê weşandin. Almanax jî alî Navenda Lêkolinên Kurdi lî Moskoyê hatiye amadekirin. Dî redaksiyona Almanaxê da hîm alimên kurd hîm jî yê biyani hene. Pirtûk 264 rûpel e.

NÛ DERKETIN* NÛ DERKETIN



Adrêsên Xwestinê:

DENG YAYINLARI
Tarlabaşı Cad. Kalyoncu Kulluğu
Mah. No:232 Daire 4
Beyoğlu İstanbul

WEŞANÊN ROJA NÛ
Gustavslundsv. 168 A, 1 tr.
167 51 Stockholm - Sweden